

WELAT

11

SAL: 1

31 Adar - 6 Avrîl 1996

BUHA: 50.000 TL



*Ji 28'yan
Enver Aytekin:*

Dîrok li rastîya xwe digere

Rûpel 8 - 9

*Samî Berbang:
Li Kurdistanê
rewşa tenduristiyê
jî ne asa ye*

Rûpel 3

*Sîrwan Rehîm:
Karaseta
Helebçeyê di
hîlbesta kurdî de*

Rûpel 4 - 5

*Cemşîd Bender:
Zimanê arî ji
Zagrosan li Evrûpayê
belav bûye*

Rûpel 10



Cil û bergên dora Mûşê
Wergirtan mîran



Panela Enstituya Kurdî
Kurd: Keda erzan in



Nazê: Kasetta dawîn lê na
ya nû

Ji Xwendevan

Jî berpirsên rojnameyê re hin pêşnî
yazên min hene. Divê ew pêk bênu ku,
firotina rojnameyê zêdetir bibe.

1- Divê kampanyayek bê vekirin.
Di vê kempanyayê de wiha bê gotin:
"Her xwendevanek du rojnameyan
bistîne û yekê bide dostê xwe"

2- Divê, reklama rojnameyê di tele-
vîzyona MED'ê û rojnameyên rojane
de derkeve.

3- Divê, rojnameynê ku vedigerin,
nayêni firotin wek protokol ji sendîka û
komeleyan re bêni şandin.

4- Divê, di rojnameyê de reklamên
pirtûkan, kasetan û tiştîn çandî bê we-
şandin. Ev ji bo aboriya rojnameyê
baş e.

5- Divê ji bayiyan bê pirsîn, ka roj-
name bi dizî an bi eşkere té firotin. He-
ke bi dizî têni firotin, kijan bayî be, bê
ikazkirin.

6- Divê xwendevanen ku nameya
yekemîn şand, ew name muheqeq bê
weşandin. Ew bandorê li ser xwendevan
çêdike. Çirokên ku xwendevan
şandin jî divê bêni weşandin.

7- Çalakiyên wekî sahiyan bê çeki-
rin. Ev jji bo kampanyayê baş e.

8- Divê têkiliyên we bi xwendevan
re hebin. Carinan hûn telefonî wan
bikin. Ji xwendevanen ji bo alîkariya
firotinê alîkariyê bixwazin.

ÇIYA MAZİ

6

7

13



Tevkujiya spî

MEHMET GEMSİZ

Serê du sed salan e ku gelê kurd xweşî
ji xwe re nedîtiye. Her serhildayîma-
ye; tim li piya bûye. Di vê navê de jî
bi hovîtiyên mezin re rû bi rû maye, tiştîn
kesnedîti dîtiye û wan jiyane. Wekî koçbe-
ri, sîrgûn, kuştin, talan, wêranî, zîndan tev-
kuji...

Dîrokzanen kurd, dîroka serhildanen
kurdan ên neteweyî bi Serhildana Baban-
zade Abdurahman Paşa (1806) didin dest-
pêkirin. Destpêkerê serhildanen neteweyî
Abdurahman Paşa ye.

Kurdan, ji vê demê ve dest birine xwe,
ji bo serbestî û serxwebûna xwe, ku iro jî
ev yek berdewam e.

Serkomarê Tirkîyeyê Süleyman Demir-
lel, li gorî daxuyaniyan gotiye ku kurdan
28 caran serî hildane û di dawiyê de têk
cûne. A dawî jî ya 29'an e, dê ew jî bişkê.

Fermana kurdan gelek caran derxistine,
ji Stenbol û Enqereyê. Kurd bi tenê mane-
ya fermanê dizanin. Ew, tevkûjî ye, talanki-
rin e, veqetîn e, ... û sîrgûn e, xerîbî ye.

Pîşti ku tevkujiya sor dest pê kir. Ên ku
ji wê filîtin, îcar ketin defa tevkujiya spî.
Jixwe ya heri xeternak jî ew e.

Bi qanûnen cur bi cur wekî "mecbûrî is-
kan" kurd ji cih û warêni xwe hatin rakirin.
Ew ajotin çol û pesarîn Anadolê. Sînor jî
datînin, rayedarîn pergala kemalî; dibêjîn
cihîn ku kurd lê bêne bicihkirin, ger e rê-
jeya (nîspeta) wan % 5 nebihure, di nava
tirkan de. Mebest jî vê qanûnê helandina
kurdan e.

Lê kurd, li her cihê ku lê hatine bicihki-
rin, li ber xwe didin. Xwe, zimanê xwe,
dab û nîrîten xwe, cil û bergên xwe, ram-
anen welatparêzi û netewexeziyê diparêzin.
Bi gotina kurt, pir bi tirûş derdikevin. Iro
kurdan, li gelek deveren Anadolê, gund û
navçe ava kirine. Nifusa hin bajaran bi gi-
ranî jî kurdan pêk tê, û ew tev de jî bi do-
za xwe re hişyar in.

Bi serhildana 29'an re jî, kurd ji welatê
xwe hatin dûrxistin. Hin jî wan li welatê
xwe bûn koçber û hin ji wan jî berê xwe

dan bajarên Anadolê wekî Edene, Mersin,
Îzmît, Îzmîr, .. Stenbolê. Li van bajaran edî
mirov ji xwecihîyan bêhtir li kurdan rast tê.

12 sal berê, gava ku ez hatibûm Stenbo-
lê xwendinê, hesreta me ew bû ku me kur-
dek bidîta û pê re bi kurdî xeber bida. An
jî, ji wan kurdî guhdañ bikira. Ez qet ji bîr
nakim, gava ku hin kes bi hev re bi kurdî
biçeyivîna, ji dûrî min guhê xwe li wan
bel dikir.

Xebera malê û ya bajêr hev negirtin.
Rayedarîn dewletê dixwestin ku kurd, li
biyaniyê bihelin, xwe ji bîr bikin, tevî tir-
kan bibin, xweziya xwe bi wan û awayen
wan bînin. Her wiha, dilê wan ew bû ku, ji
Balkanan, ji Kafkasian, ji Asyaya Navîn tir-
kan bînin û bikin cih û warêni kurdan. He-
ta, hin anîne jî. Ci di destpêka avakirina
komarê de û ci jî di wan salêni dawî de. Eş-
kere jî ev yek kirine û mebest û armancê
xwe daxuyandine.

Daxwaza wan, xerakirina bastûra (bun-
yeyâ) demografik a Kurdistanê bû. Lê....

Îcar, iro ew gazinc dikin ku, devera
kurd diçinê, bastûra wê ya çandî serobin
dikin, ji ber ku kurd ne bi tenê, bi fizikiya
xwe diçinê, çanda xwe, dab û nîrîten xwe,
gundê xwe, navçeya xwe, bajarê xwe, bîr
û baweriyyen xwe, ... û ramanen xwe jî
dibin wê derê, hem jî ji berê bêhtir dest
diavêjine hêjahiyyen xwe.

Girîngiyê hînbûna ziman

**Belê heyâ iro çîma em li ser zimanê xwe yê zîmkârî
nesekeñî? Ma heyâ kengê ev biyanîbûna ziman,
biyanîbûna çandê wê li ser me be? Ma ne bes e?!**
**Çîma heval li ser pirtûkîn kurdî yê zanyarî, yê
wêjeyî û yênerî xebateke bi dil û can çenakin?**

I. HALİL KOŞAR

Ziman, têkiliyên di navbera
mîrovan, dan û standina di
nav mîrovan de bi kar tînê.
Têkilî û jiyanê bi pêş ve di-
be. Ji hêlekê din ve jî ziman, di nav
hêmanen netewibûnê de ye, hêmaneke
herî girîng û mezin e. Ziman çeka nete-
weyîbûn û serfiraziyê ye. Raman û bîr-
doziyan bi pêş ve dibe. Ji bo vê yekê jî
mîrovê bêziman, mîna aşê bêav e, ne
berhem û ne jî pêşketinek jê çedîb. Mîrovê
ku qedr û qîmîta zimanê xwe
nîzânîbe, rûmetê nade jiyana xwe jî.

Di nav her civatê de ziman cihekê
mezin û fireh digire. Ne xasim ku ew-
civat, geleki bindest be, wê çaxî ziman
hê bêhtir, giraniya xwe dide ser wî mi-
letî. Lîkolîner, zanyar û zîmanzanê ge-
lê kurd Celadet Bedirxan, li ser vê ba-
betê jana gelê me wiha tînê ziman:

"Miletîn bindest heyîna xwe ji ser-
desten xwe bi du tiştan, bi du quwetan
û bi du çekan diparêzin. Ol yek, ziman
dido. Lî heke ola milletê serdest û bin-
dest yek be, hingî çek yek bi tenê ye û
bend bi tenê ziman e."

Belê ola me û ola serdesten me ereb,
fars û tirkan yek e. Ji ber vê yekê jî zi-
manê kurdî ji bo hebûna gelê kurd ci-
hekî pir bi rûmet û mezin digire.

Em hew karin bibêjin: "Dem ne de-
ma zimanê kurdî ye", vê hevokê edî
gere em hew bînin zîmîn. Ji ber ku di
her hêlê de xebateke sooresgerî û zan-
yarî li ser zimanê kurdî çedîbin. Bi ras-
tî em dikarin bibêjin ku gere em li ser
zimanê xwe pir bisekinin. Belê heyâ i-
ro çîma em li ser zimanê xwe yê zî-
mkârî nesekeñî? Ma heyâ kengê ev biyanîbûna
çandê wê li ser me be? Ma ne bes e?! Me dixwest
ku iro hemû heval li ser pirtûkîn kurdî
yê zanyarî, yê wêjeyî û yênerî xebateke
bi dil û can çenakin.

Em girtiyen di zîndanan de, ji bo
pêşvebirina zimanê xwe, em ci çalaki-
yan dikin? Em çiqas pirtûk û rojna-
meyen kurdî dixwînî? Em çiqas karin
ziyaretvan û seredanen xwe re, bi zi-
manê xwe dixaivin? Em xwe û rama-
nen xwe, nas dikin? Em çend saetê li
ser van pîrsan kûr kûr difikirin?

Gelek pirtûk û rojnameyên kurdî
tên, lê em tenê li wêneyen wan dînihî-

rin û wan diavejin cihekî. Dewleten
mijokdar ew qas qedexeti derxistîne ji
bo zimanê me, em jî bi van tewrîn xwe
alîkariyeke mezin didin dijmin. Lî
haya me ji vê yekê nîn e.

Bi zimanê kurdî peyvîn rîzanî û zi-
manê felsefi jî xweş tê ziman. Di van
hêlan de jî gelek nîvis û pirtûk derketi-
ne. Bes ev hînbûn hema bi derbekê ve
nabe. Di Kongra Pêncan a Serfiraziyê
de, der heqê zimanê kurdî de birayren
gelek xwes, ji bo pêşketin, axaftin,
xwendin, perwerdehiya bi zimanê
kurdî, hatine standin. Divê em li ser
van bîryaran biponjin.

Di girtîgehê de, di hêla yekitiya zi-
manê kurdî jî gelek mecalen me hene
Ji çar rexen Kurdistanê heval hene. Za-
za, yê bozî, yê torî, yê xerzî, yê ji
Başûrê Biçûk, yê Rihayî û hwd. hene

Yekîtiyeke dewlemend em karin
çebikin. Em karin alîkariyeke mezin
bidin hev. Em vê jî bibêjin ku gelê me
yê li derive ji me girtiyen çêtir û zanatî
zimanê bi kurdî diştexile. Em li gelê
xwe mîyeze bikin, emê gelek dersen
mezin derxin. Di hêla xwendin,
nîvisandin û pêşveçüyinê de gavên
mezin avêtine.

Ji bo şîrîkirin, xurtkirin û dew-
lemendkirina zimanê kurdî ci ji destê
me bê, em bikin. Em vê baş bizanibin
ku hînbûna zimanê kurdî ji bo pêşerojê
pir girîng û pêwist e. Ji vir û bi sun de
em zendên xwe badin û dest bi xwen-
din, axaftin û nîvisandina zimanê xwe
bikin. Em vî karî ji xwe re bikin dîrûs-
me (slogan) û derbasî jîyanê bikin.

LI HEVHATINA PKK û PDK'ê, ji bo aştiyeke gişî rê vekir. Ji bo ku yekîn di navbera rêxistinê kurd de pêk bê, rêxistinê kurd amadekariya civîneke berfireh dîkin. Pişî peymana PKK'ê û PDK'ê, partîyên Kurdistanê bîryar dan ku li Sûriyeyê bicivin. Li gorî agahîyan wê rêxistinê sereke yên Kurdistanê tevî besdarf wê civînê bibin.

Tê gotin ku serokê PKK'ê Abdullah Öcalan jî besdarf vê civînê dibe. Her wiha tê gotin ku wê di vê civîne de li ser mercen avakirina Kongreya Neteweyî niqaşan bikin. Lî hêla din dewleta tirk ji ber ku nikare rê li ber wê civînê bigire, gefan li Suriyeyê dixwe.



VAN DEMEN dawîn, çapemeniya tirk dest bi provakasoyan kir. Li hemberî vê girtîyan jî dest avêt hin çalakiyên wekî grevê birçibûnê.

Nivîskarê rojnameya Hüriyet Yıldırım Çavlı di nivîseke xwe de ev çalakî wekî destpêka serhildanan nişan dide. Ew dibêje: "Heke di girtîgehan de hin tedbir neyêne hildan û Wezîrê Dadê yê Tirkîyeyê Mehmet Ağar hin şaxen girtîgehan ku di bin destê wî de nîn in, nexe bin destê xwe wê serhildan di girtîgehan de dest pê bikin. Her çiqas ew dibêje: "divê polis nebin wezîrê dadê ji", parêzeriya Mehmet Ağar hildigire ser milen xwe."

NÜÇE

Li Kurdistanê rewşa tenduristiyê jî ne asa ye



Li Kurdistanê wekî hemû problemên din, meseleya tenduristiyê jî bi politikayên bingehîn ên dewletê ve girêdayî ye. Ji ber şer, di warê tenduristiyê de jî, rewşeke awarte heye. Li gorî raporeke Tüm Sağlık-Senê di sala 1994'an de li Amedê 31 hezar kes bi nexweşîya tayê ketine, 18 kes emelî bûne û 5150 kes bi tifoyê ketine. Her wiha di heman salê de 62 kes bi sorikan ketine.

Ev hefte di salnameya resmî de wekî Heftiya Tenduristiyê hatîye binavkirin. Her çiqas wekî Serokê İHD'ya Amedê Mahmut Şakar jî dibêje, li Tirkîyeyê cejn û pîrozbahîya tiştîn ku nîn in, tê kîrin jî, me xwest bi munesebeta vê heftiyê li rewşa tenduristî ya mirovîn li Kurdistanê çavekî bigerînin. Lewma, me ji bo agahîye serî li hin saziyên ku tekildarê vê mijarê ne, da. Tiştîn ku hatîn gotin, bi piranî rewşa heyî diyar dikin û pêwîsiya hinek bergiriyen di vî warî de destnîsan dikin.

Derdikeve holê ku li Kurdistanê mirov êdî ji ber ku ketine derdê lijiyanêmanê, tiştîn wekî tenduristî û perwerdehiyê girîngiye xwe winda dikin di çavên mirovan de.

Serokê İHD'ya Amedê Mahmut Şakar, diyar dike ku serlêdanen ku li İHD'ya Amedê têن kîrin, li gorî yê ku li İHD'ye Stenbol û Enqereyê dîbin, hindikir in. Lewre mirov êdî îşkenceyê wekî tiştîk jî rîze dibînin. Şakar balê dikişine ser nexweşînen şobî (têger) û dibêje: "Heke hin tedbir nayêñ girtin, wê li herêmîn wekî Wan û Culemergê gelek kes bimirin."

Li ser vê mijarê Sekreterê Perwerdehiyê yê Tüm Sağlık-Senê Dr. Muqmet Can, ji raporeke ku ewê derxin, hin reqemân pêşkêş dike. Li gorî vê raporê di sala 1994'an de li Amedê 31 hezar kes bi nexweşîya tayê ketine, 18 kes emelî bûne û 5150 kes bi tifoyê ketine. Her wiha di heman salê de 1162 kes bi sorikan ketine. Hin nexweşîyen ku herî zêhf li herêmî têne dîtin ev in: Ta, emel, tifo, dîzanterî, sorik, zerik, paratifo.

Ji van hin nexweşîyen wekî duşaxe (difteri), xeneqîk, derdekurtan (tetenoz) û sorik nexweşîyen ku berçitriya wan bi derziyê (aşı) gengaz in.

Dr. Can diyar dike ku reqemân di raporê de ji saziyên resmî yêndewletê, wekî miduriyeten tenduris-

tiyê yêndewletê, hatîne stendin. Lewre jî divê mirov bîzanibe ku hejmarêna rastîn ji van gelekî zêdetir in. Dîsa jî ev rapor dide zanîn ku di navbera salen 1990 û 94'an de ji ber pneumonia (zatûre) di 0-1 saliya xwe de 116, di 1-4 saliya xwe de 48 zarok li Amedê mirine. Her wiha di navbera 5-9 saliya xwe de 19 zarok mirine, sedema mirina wan nehatîye diyarkirin.

Sedema bingehîn a rewşa xerab şer e

Bi gotinê Serokê İHD'ya Amedê jî eşkere dibe û rewşa tenduristîya mirovan berî şer jî ne baş bûye, lê pişî şer xerabtir bûye. Her wekî di pêşgotina rapora Tüm Sağlık-Senê de jî hatîye diyarkirin, pêkhatîna derfetê tenduristiyê ji bo mirovahîyê hê jî wekî xewnekî ye. Lî her sal li dora 900 milyar dollar li çekan tê xerckirin, heke ev pere li mirovan bê xerckirin, pêdiyîn bingehîn ên 2 milyar kesî tên temînkirin.

Niha li Kurdistanê wekî hemû problemen din, meseleya tenduristî û hêvotinê jî bi politikayên bingehîn

en dewletê ve girêdayî ne. Serokê Komeleya Mafen Mirovan şaxen Amedê Mahmut Şakar li ser vê yekê wiha dibêje: "Jêderka hemû arîşeyan nenaşîna mafê kurdan ê besdarbûna jiyanâ civakî û siyâsî bi nasnava xwe ye." Şakar bi bîr dixe ku li herêmî rewşeke ne-asayı heye. Serokê İHD'ya Amedê, gotina endamîn heyeteke biyan, pişî ku çûne taxeke koçberan tîne zîmîn. Ew gotin rastiyê bi şêwîyeke baş diyar dikin: "Jiyanâ di vê rewşê de, bi serê xwe binpêkitina mafen mirovan e."

Divê bê gotin ku tevî mirovîn ji rîzê, kedkarên ku di vî warî de xebatê dikin jî hin caran ji tenduristîya xwe, heta ji canê xwe dîbin. Heta niha gelek xebat kirin tenduristiyê ji ber sedemîn cur bi cur hatîne girtin, îşkence lê bûye, hatîne kuştin. Li gorî agahîyen ku Dr. Muhamet Can dide, heta niha 15 endamîn Tüm Sağlık-Senê hatîne kuştin. Dema tenduristî bi destê xebatkarên wê nekeve, het hal wê ji bo mirovîn ji rîzê xewn be.

SAMÎ BERBANG

Karesata Helebçeyê di helbesta kurdî de

Hefe ku bûyera Helebçeyê wîjdanê hemû mirovahiyê bihejîne û wisa bike ku ew li hemberî wê zilm û zordestiyê, dengê xwe bilind bikin, çawa wîjdanê gelê kurd nahejîne. Xuya ye ku di nav gelê kurd de, çîna rewşenbîran û di nava wan de jî, şairîn kurd dengê xwe yên zelal ji bo wê bûyera bi ês bilind kirin û bi helbestênen resen û afîrîner di şîna Helebçeyê de, besdar kirin.

Bêguman heke ku Helebçe ne ya me be jî, dîsa em li hemberî karê wisa hov radiwestin û dîsa jî, stranan jê re bibêjin. Lê belê, ji ber ku Helebçe, wê birîna bi jan û ês dikin laşê me, eşkere ye ku emê zelaltir stran jê re dibêjin û sîrûdîn nemir ji bo wê tomor bikin.

Şairê me Mihemed Kurdo, wê tawanê ew qas mezîm dibîne ku mohra berpirsiya cinayetê li eniya hemû cîhanê dixe:

*Morêkî tawan bû / le cergey welatî,
Sitem û Pêşmerge û çiyawê / Be rojî nîwero/ Nayane cebînî dinyawê..*

BI KURMANÇI

*Moreke tawanê bû / Li nava welatî,
Sitem û pêşmerge û çiya / Bi roja nîwero/ Li eniya dinyayê dan.*

Gelê kurd geleki wisa ye ku, awêtebûnike ruhiyeta wî bi sırûsta welatê wî ve heye. Xweşikiya nîştimanê wî, wisa kiriye ku, her tim hez ji bedewî, aşî, azadî û nazikîyê bike. Lê dijmin jê re dibin asteng û wî mafê mirovahiyê dagir dikin, bi wê helwest û dagirkeriya dijminan, jîngeh û hemî tiştîn din têñ lewitandin.

Şîrko Bêkes, di pir şîrîn xwe de, qala Helebçeyê dike. Di şîrîn wî de, jîngeh heman jîngeh e û nîştiman jî, her heman nîştiman e:

*Çwardey mang bû / Le ser Goyje,
Ba qelmekey firanîm/
Katê girtmewe û pêm nûsî,
Pol pol firîn wişekanîm/
Panzey mang bû
Sîrwan qelemekey birdim/Katê girtmewe û pêm nûsî,
Bûn be masî şîrekanîm..
Şanzeý mang bû / Ax şanzeý mang.
Ke Şarezür qelemekey/ Lé wergirtim,
Katê daymewe binûsim/ Wek Helebce;
Wişik bûbûn pencekanîm..*

BI KURMANÇI

*Çardehê mehê bû / Li ser Goyje,
Ba qelema min bir/ Dema min qele
girt û pê nivîsî,
Peyvîn min ref bi ref firîn..
Panzdehê mehê bû/
Sîrwan qelema min bir,
Dema min girt û min pê nivîsî/
Şîrîn min bûn masî..
Şanzeý mehê bû / Ax şanzeý mehê,*



*Ku Şarezür qelema min/
Ji dest min girt,
Dema da min, ku ez binivîsim/
Wekî Helebçe,
Tiliyên min hişk bûbûn..*

Diyar e Helebçe ji xeynî ku tawaneke mezin û zilmeke neheq bû li gelê kurd hat kirin, her wisa bahoz û lehiyekê ew qas dijwar bû, ku hemû çokê berxwedanekê pê hatin şikestin. Li hemberî teknolojiya hêzên mezin ên dinyayê, pêwist bû êdî gelê kurd stratejiya xebata xwe biguhêre. Lewre di Helebçeyê de û li hemberî çekê kîmyewî hemû tişt û kes hişk û bêcan diman.

Eşkere ye ku, Helebçe ji aliyê Sadamê mirovuj ve hat şewitandin û wêrankirin. Lê belê li hemberî Helebçeyê ji xeynî wî, dewleta Îran û hêzên me bi xwe jî, xwediyê tawan in. Ew bûyeren dilşewat hemû ji aliyê Şîrko Bêkes ve, di pirtûka "Derbendî Pepûle" de, pir zelal têñ zîmîn:

*Le berdem em hewa şete da/
Kê detwanê be pêwe biwestê?
Kê destewestan nabê?/
Her le Gatakanî Zerdeştewê,
Ta Sermayey Marks/
Ta şîmşerêkeş Zülfeqar,
Rişanewe û bilqîyan kird û xip bûn.
Bo sibeynê/ Minarekan darelektrîkî ya
mîlyan helekêşam.*

Hendê destî xoşîm, pencekanî xomyan edzi.

*Seyir bû, ew rojem qet qet le bir naçê
Le taqe raste şeqamî em leşe sard û si-
re da/ Çawî zeqim biribûwe pasdarêkî
riş nûranî/ Be ser minî Helebcewe de-
girya û/ Keçî xêra xêras destî ekird be
gîrfanî da û/ Le denke mîwîjî gîlêneka-
nî Sine û Sablaxî exward.*

BI KURMANÇI

*Li pêş vê hewaya dîn/ Kî dikare li ser
lingan bisekine?
Kî şas namîne?/ Her ji Gatayê Zer-
deşt,
Heya Sermayeya Marks/ Heya Şîmşerâ
Zulfîkar/ Vereşyan û xeniqîn.*

*Ji bo sibe/ Minareyan darê elektrîkî ya
milê min hilkişandin.
Hin desten min bi xwe jî, pençeyen min
didizîn.*

*Ecêb bû, tu car ew roj ji bîra min naçê.
Di şeqama vî laşê sar û ziwa de,
Min bi çavêن xwe yên şasmayî li pasda-
rekî rû bi nû dînihîrt,
Ji bo Helebçeyê digiriya,
Lê bi lez jî, dest dibir bêrîka xwe,
Ji mîwîjîn çavêن Sine û Sablaxî dix-
war.*

Ev e mergesat, ev e tora tawana ku,

ji aliyê siyasetvanen hemdemî ve, we dafik tê danîn û Helebçeyê, wê kevok xweşik û bedew dixin nav. Vêca di van bûyer û çêbûnen aloy û tevlîhev de Şîrko Bêkes bi awayekî pir balkê peyv dane axaftin û bêyî ku zorê bi xwe, di nav şîrîn bedew de, ew bûyera bi tirs û dizêw bi cih kiriye. Jixwezîfeya hunera bedew jî, ev e.

Ji wan şairê ku bi awayekî hunerî şêwazeke bedew Helebçe di çarçovê şîrî de, bi cih kiriye, yek ji wan jî, Refiq Sabîr e. Refiq Sabîr di hembêza afandinê de, lawikekê di guhê Helebçe hemû gelê kurd de dibêje. Lawikê Helebçeyê ku, şîrekî dirêj e Refiq Sabîr heke çend berhemên xweş hebin, ku bo wê tevkuyîhâtine nivîsandin, ji wan jî ev şîrî nemir e, ku jê re hat ye nivîsandin. Vî şairî karibûye bi şwaza xwe ya taybet lorînekê ji wê şehî dê re bibêje:

*Rabe role neberdekom/
Rabe şare gehîdekom.
Rabe hawar û firmeskî/
Xolemêşî korpekanit
Bişorewe/ Rabe wîjdan û cwamêri,
Be ser em dunya dune da/ Bibeşewe.
Rabe lekey şermezari/ Ser rûxsarı do tekanman
Bo bisreve/ Manayekî niwê bo tawar
Bo yeksanî û/ Birayetîdiroznaney
Tor û masî û/ Pet û gerdin,*

Bidozewel / Rabe role cwamêrekem.
Rabe role şehidekem.

BI KURMANCÎ

Rabe roleyê min ê neberd/
Rabe bajarê min ê şehîd.
Rabe hawar û hêstirê / Bi xweliya biçû-
kén xwe,
Bisüreve / Rabe wîjdan û ciwanmîrî
Li vê dînyaya piç / Par vebike.
Rabe lekeya fedikirinê/
Li ser eniya dostêne me,
Ji me re bisre ve/
Maneyeke nû bo tawan,
Ji bo wekhevî / Biratiya derewtiyê,
Tor û masî û / Pet û gerden
Bibîne.
Rabe roleyê min ê ciwanmîr /
Rabe roleyê min ê şehîd.

Bûyer wisa dike ku, ev peyvîn nex-
wes di nav humereke bedew de, bi cih
bibin. Ya rast wezîfeya şîr ku, yek ji
hunerên bedew e, ne ev e. Lî belê heke
bûyerên bi vî rengî biqewimin û şîr ji,
mijûlî hin tiştîn din be, ne her bi tenê
hewesta xwe ya mirovahiyê winda di-
ke, belkî bedewbûna xwe ji, winda di-
ke. Ez bawer im ku, di edebiyata her
neteweyî de, mînakîn bi vî rengî pir in.

Belê vêca pêwist e Helebce rabe û
wîjdan û camêriyê bide vê dînyaya
piç. Ü şerma eniya dostêne me yêne dere-
wîn bisre. Bi van tiştan re ji, maneyeke
nû, ji bo wekhevî û biratiya me û wan
(em û dostêne sexte) bibîne. Bi xwe

rewşenbîrên dost newêribûn ku, du he-
vokan jê re binivîsin. Ev yek dide xu-
yakîn ku, tu kes di xema Helebçeyê û
gelê kurd de nîn e. Lewma Refiq tu tiş-
ti li hêviya wan nahêle û dibêje:

Çirayekan dagîrsêne/
Ba hêndey dî tînû nebîn.
Alayek le şev da helke/
Nawî deneyin liqe baran.
Be tirîfe û tem termanke/
Debîne geşe, Yan xerman.

BI KURMANCÎ

Çirayan pêxe / Bila ew qasî din tî nebin.
Alekê di şev de bilind bike/
Nav lê dikin liqe baran.
Bi tavehîv û mijê me sil bike/
Em dîbin ges e / An ji, xerman.

Belê gerek e di ketinê de, em bi xwe,
xwe rakin û destê xwe ji tu kesî re dirêj
nekin. Vê peyama ku em ji şîrîn kurdî
dibîhîzin, ji mîj ve, dîroka heres û şî-
kestiyêne me ev yek selmandiye ku, di-
vê em çirayan bi destêne xwe pê bixin.

Şîrko û Refiq, her du ji, wê tevkûji-
ya bi êş, bi şewazeke pir şiyaw dikin
evîna berhemêne wisa ku, zû xwe didin
pejirandin. Li nik herdûyan peyv nake-
vin jêr mezinatiya bûyerê, ew bi şewi-
tandinê re, pê dîbin û ji hundir ve agir
digirin, lewma wê qewimîna mezin di
şîrîn biçûk de, bi cih dikin:

Ba Helebce/
Diwa semfonyay em şewe bê.
Ba Helebce / Peyamî sûrî newe bê.

Ba diwa kernevalî xwên û/
Birînî ebedî rohî netewe bê.
Ba Helebce / Ta hetaye, Helebce bê û
Helebce bê û / Helebce bê.

BI KURMANCÎ

Bila Helebce/
Senfonyaya dawî ya vê şevê be.
Bila Helebce / Peyama sor ya nû be.
Bila karnevala dawî ya xwîn û
Birînî ebedî, ruhî netewe be.
Bila Helebce /

Heya dawiyê, Helebce be û

Helebce be û / Helebce be.

Refiq Sabîr di şîra xwe ya dirêj
“Lawîkî Helebce” yê de, vî tiştî dibêje.
Lî belê Helebce nebû senfoniya dawî
ya wê şeva me. Jehra wê di qirika
têkoşîna me bi tenê di Helebçeyê de
ranewesta. Nêxîr cesteya vê axa birîn-
dar, pistî Helebçeyê ji, pir bûyerên
kezebşewatî bi xwe ve dît, ku di nav
wan de, Enfal û Rev ji hemûyan bi
bandortir bûn.

FERHENGOK:

Karesat: Qewmîna mezin
Çîn: Tebeqe
Pirse: Tazê, fatîha
Sirûd: Marş
Tawan: Sûc
Awête: Tevlihevkirineke xweskî
Jingeh: Hawîrdor
Heman: Eynî
Sîrwan: Çemekî mezin e, li nêzîkî

Helebçeyê

Derben : Zar gelî, devê gelî
Pasdar: Jandermeyê Îranî.
Sablax: Navê duyemîn ê bajarê

Mehabadê ye

Tor: Şebeke

Dizew: Pir ne xweskî

Role: Nevî, ji bo nêr

Bisrewe: Jê bibe

Geşe: Geşbûn.

Peyam: Mesaj

Selmandin: İspatkirin

Ceste: Laş, gewde, bedena însen

Resen: Esîl

Zülal: Dengê pir his ê şoreşgerî

Tomar: Qeyd

Sitem: Zilm

Maf: Heq

Lewitandin: Pîskirin, xerabkirin

Hest: His

Goye: Ciyayek e li Silêymanî

Şarezûr: Devereke mezin e ku bajarê

Helebçeyê ji, di nav de ye

Pepûle: Minminok

Sine: Bajarekî li rojhilatê Kurdistanê

Mergesat: Trajedî

Aloz: Tevlihev

Şewaz: Uslûb

Sirîn: Malaştin (silmek)

Liq: Şax

Xerman: Hasilata ziraatê

Heres: Ji bo ketin û têkçûna şoreşen

başûr tê xebitandin

Şiyaw: Layiq

S. REHİM

Şoreşgerê kurd Edip Karahan

FIRAT CEWERÎ



Dêrik pir xweş e, hêja ye pesnê.
Çi bikim nakeve dest ji ber vê xeşmê.

QEDRİCAN

Dêrik, bêhtir bi Dêrika Ciyayê Mazî tê
naskirin. Dêrik di quntara ciyê de
ye; ciyayê wê bi darên mazî ve
xemîlandîn, an ji xemîlandîbûn. Dêrik ji
sala 1882'an û bi vir ve bûye bajar. Ava
bajêr hênik e, hewa wê xweş e, lawê wê
zexm û mîrxas, keçen wê bejînzirav, spehî
û şîrîn in. Dayîk wê lawêni bi rûmet,
welatîz, mîrxas û şerker anîne dînyayê.

Yek ji van lawan Edip Karahan e. Ev
mîrxasê hanê, di sala 1930'î de tê dinayê,
dixwîne, xwe dişîne û dibe ebûqat. Di ber
xwendînê re, ruhiyeteke welatparêziyê pê re
çedîbe, rastiya welatê xwe dibîne û ji bo
hişyarkirin û bipêşdestixina mîletê xwe, dev
ji navê xwe û malê dînyayê berdide û xwe
bi hemû hêza xwe ve diavêje meyadana şer.

Edip Karahan her çîqas di hoyin ne xweş
û di demeke kêmkadro de jiyabe ji, dîsan
tiştîn ji destêne wî hatine wî texsîr nekiyî.
Ew bi ronakbîran re bûye ronakbîr, bi kark-
eran re bûye karker, bi gundiyan re bûye
gundî û di meydan û kolanan de bi
têkoşeran re bûye têkoşer. Ew peyayekî tê-
hişti, zana, giran, nefşbiçûk û xwende bû.
Ya herî giřng ji ew welatîzekî mezin bû.
Di kovar û rojnameyê cihê cihê de, li ser

rewş, jiyan, ziman û kultura kurda nîvîs û
bendêne hêja nîvîsandiye, polîtîkaya dewleta
Tirkiyeyê ya der heqa kurd û Kurdistanê de
rexne kiriye, ji bo rastîdîtin rastiya
neteweya kurd, ronakbîrên tîk hişyar kiriye.
Di bendeke xwe ya bi sernava “Hin Nixte”
de rojnamevan û ronakbîrê naskirî Abdi
İpekçi rexne dike û wilo dibêje: “Li
Tirkiyeyê hunermend û ronakbîrên ku bi
zimanê Mau-Mau dizanîn hene, li ser wan
helbest û stranan dinivîsînin û di meyx-
aneyan de ji bo azadî û serbixwebûna reşik
û çermisoran qedehan li hev dixin û noşan
dîkişînin. Lî gava mirov ji van celeb huner-
mend û ronakbîran re behsa kurdan dike
“Welat ji dest diçe, welat parce dibe”
dibêjin û wek dînên cin li wan bixe, baz
didin.”

Edip Karahan bêtirs û bi mîrxasî geh bi
pêñûsa xwe di nav rûpelên kovar û roj-
nameyan de dihate dîtin, geh ji di civatê
gundî, karker û xortan de doza wan bi wan
dida nasîn. Ew Gandiyekî kurd yê bi felse-
feya materyalist bû.

Berî niha bi kurtedemekê, gava gotin ji
Edip Karahan û xebatên wî vebû, xortekî
Dêrikî ku pêrgî wî bûbû û ew ji dûr ve nas
dikir, wilo got: “Berê zarakan rojname li
çarşî û çayxaneyan digerandin, bang dikir û
difirotin. Mezinan qet ev kar nedikirin. Dibû
ku li bajarêne mezin dikirin, lê li Dêrikê tu
peyan ev karê han nedikir. Lî min her tim
peyayekî dirêj, bi navmil, porspî, bi sim-
bîlêne mezin û komek rojname di bin çen-
gan de, didît. Ji min we bû ku ew rojname-
firoş bû. Tê bîra min ku min henekê xwe pê
kiribû û min di dilê xwe de gotibû, li
qelafetê wî binihêrin û wekî zarakan roj-
nameyan difiroşe. Min rojekê ev yeka hanê
ji bavê xwe re got. Bavê min pêşî bi tîqînî

keniyabû, dû re bi carekê ve kenê xwe
biribû û wekî bi mezinekî re bipeyive ji min
re gotibû: “Ew Edip e lawê min, Edip
Karahan e... Ew ne rojnamefiros e, ew wan
rojnameyan gişî dixwîne. Ew ebûqat e û ji
bo azadiya kurdan dixebe.”

Sala 1974'an min Edip Karahan li serba-
jare Tirkiyeyê, li Ankarayê, li pirtûkx-
aneyekê dît. Gava min ji wê re behsa ser-
pêhatiya xwe kiribû, ew bi pîrqînî
keniyabû.”

Ne bi tenê rojnameyên rojane, lê ji
nîvîsîn wî xuya dibe ku ew gurekî xwend-
inê bûye. Wî di bin navê cihê cihê de
(wek Edip Osmanoğlu, Mahmut Bayraktar,
Hamit Mazıdağı, Konuk Yazar) di kovar û
rojnameyan de nîvîsîn teorîk nîvîsandine,
dû re gava bi rola kultur û edebiyatê ya di
têkoşîna gelê kurd de hesiyaye, di sala
1962'an de dest bi weşandina kovara
Dicle-Fîrat kiriye. Mixabin, mîna gelek
kovarîn kurdî, jiyanâ vê kovara bi rûmet jî
pir dom nekiyî. Bi tenê heşt hejmar der-
ketiye. Hejmara dawî ya kovarê di çardehê
gulana 1963'an de derketiye.

Ji ber nîvîs û bendêne ku wî di Dicle-Fîrat
de nîvîsandibûn, du sal ceze lê hatiye birîn;
salekê li Stenbolê, salekê ji li Enqereyê razay-
e. Ji ber xebatên xwê yên di kovara Forum
de ji sala 1967'an 9 mehan li Diyarbekrê
girî dimîne û sal û nîvekê ceza lê tê birîn.
Di sala 1971'î de ji sal û nîvekê girî û heşt
salan ceza... Digel ku Edip Karahan jiyanekê
bi eziyet, bi sitem, bi işkence û lêdan derbas
kiriye ji, dîsa bi qasî qırşekî tiştek ji hêviya
xwe winda nekiyî û ta mirina xwe (1976)
bi hemû hêza xwe ji bo hişyarkirin û
azadiya neteweya kurd têkoşîn daye. Lî bi
barkirina xwe re, cîhekî mezin vala hiştiye.
Bi hêviya ku wê nîşen nû şuna wî dagirin....

Cil û bergên dora Müşe (2)

Li herêma me, mêt
şal û şapik werdigirin,
ku dîroka şal û şapik pir
kevn e. Pirtir li gundêñ
çiya kal li xwe dikin,
ku iro hema bibêje
ev celeb girêdan nemaye.
Li herêmê, şal û şapikêñ
ku xwediyê şeklêñ cihê
cihê ne, têne bikaranîñ.
Wekî şal û şapikêñ
xercikirî, yên bi şift û
xetêñ stûr û zirav, yên dûz
û sade.

Me, di nivîsa xwe ya pêşîn de, cil û bergên keç û jinan dabû nasîn. Her wiha pê re xişr û zér û ziberên wan jî. Îcar, di vê nivîsa xwe ya dawîn de, em dê li ser cil û bergên bûk û mêtaran bisokinîñ.

Girêdana serî ya bûkan

Por bi bendêñ rengîn ên hirî ve têñ honandin. Kofi û gulik li serî têne dañîn. Piş re, li dora kofiyê pûşî têne pêçandin. Pûşî jî, bi celebêñ ji hev cihê têne girêdan. Pûşî, ji paş û ji kêlekan ve têne bestandin û serêñ wan jî bi jêr ve têne berdan. Bi pey re jî, li raserê lêçekke spî, ku dor bi morî û pûlêñ rengîn inyîli ser wê jî, pûsiyeke spî tê danîn.

Girêdana din jî wiha ye: Lêçekke spî li ser kofi û gulikan têñ werkirin. Li dora lêçekê, ji heft rengî pûşî têne pêçandin. Li raser wan jî, lêçekke spî tê danîn.

Wergirtina bûkan

Keçikêñ ku dibine bûk, derpê (salwar), binkirask li ser wan jî fistanekî ku pêşî girtî û dawa wî xemilandî li xwe dikin. Li ser wî fistanî jî, fistanekî düz û ku ji qumaşen pir heja û buha ne, werdigirin. Ew cil, ji qumaşen bi sîm, ji qedifeyen bi sîmê ku dirûvê hevrîşim pê dikeve, têñ dirûtin.

Di pey wan de, cepken (mîntan) tê wergirtin, li newqê jî qûşax û kembera zîv têñ girêdan. Malbatêñ zengîn, kembera zîv bi kar tînin. Dîsa, bûkêñ malbatêñ zengîn, qedifeyen bi sîm û yên birqok ên ku dişibin hevrîşim, li xwe dikin. Bûkêñ xizanan jî qumaş û qedifeyen ji rîzê li xwe dikin.

Ji hêla din ve, goreyêñ rengîn an jî sade û harûk an jî çarox dikine piyêñ xwe.

Cil û bergên mêtaran

1) Şal, 2) Şapik, 3) Papax, egal, pûşî, kefi, derbend, 4) Ebayê ji mü 5) İşlik, 6) Gomlek, 7) Gora rîs, 8) Çarox an



jî harûk 9) Qûşax 10) Destmal
1) Hemayîl, 2) Nivîstên sêgoşe, 3) Saetêñ ku kostekêñ wan zîv in 4) Manik
5) Kerkvan

Wergirtin

Li herêma me, mêt şal û şepik werdigirin, ku dîroka şal û şapik pir kevin e. Pirtir li gundêñ çiya kal li xwe dikin, ku iro hema bibêje ev celeb girêdan nemaye. Li herêmê, şal û şapikêñ ku xwediyê şeklêñ cihê cihê ne, têne bikaranîñ. Wekî şal û şapikêñ xercikirî, yên bi şift û xetêñ stûr û zirav, yên dûz û sade.

Şal û şapik, ji hiriyê têñ çêkirin. Pêşî ev hirî bi teşiyê tê rîstin. Piş re, li herêmê bi tewnan ew têñ raçandin.


Gava ku şal û şapik tê wergirtin, li bin derpê û kiraz li xwe têñ kirin. Li ser şal û şapik jî, cepkenekî ku ji eynî qumaşî ye, tê wergirtin. Ji ber ku li herêmê zivistan sar û dirêj dom dike, mêt ebayek li xwe dikin, ku ji hirî û rîs tê çêkirin. Ev jî heye, kesen ku eba werdigirin, serokê êlan, axa û zengîn in. Li nava xwe jî qûşaxeke rîsin dipêçin. Bi gişî, qûşax mezin û dirêj in.

Mêt bi piranî, egal, pûşî, kefi, derbend, papaxa rîsin didine serê xwe û dorê jî, egal an jî kefiyek tê pêçandin.

Li herêmê girêdana serî jî, xwediyê gelek celeban e. Wekî din, mêt, goreyêñ rengereng dikine piyêñ xwe; bi taybetî havînê yên hirî û zivistanê ji yên rîs. Hartûk û çarox jî bi kar tînin.

Tîştên ku mêt bi xwe ve dikin.

Li herêma me, mêt hemayilan, nîvîstên sêgoşe diavêjine stûyêñ xwe. Hin jî bi nava xwe, bi sînga xwe û milê xwe jî datîmin. Wekî din, manik diavêjin milêñ xwe, kerkvan jî bi milêñ xwe ve girê didin û saeta ku kosteka wê zîv e, dikine ber xwe.



● 12. 4. 1995 Avrîl

Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat (PKDW) hate avakirin. Roja 12'ê avrîlê Li bajarê Holadayê Laheyê, li Salona Nederlands Congres Gebouwê vebû. Endamên parlamentoye di bin serokatiya Ismet Şerif Wanîf de li hev ciyan.

Parlemento ji 70 endamî pêk dihat, Yaşar Kaya wekî serok hate hilbijartin. Pişti avabûnê, 3 ciyânen gişî çêkirin, heke mirov li gorî mêtûyê li dû hev rêz bike: Li bajarê Awustûryayê Viyanayê, li bajarê Rûsyayê Moskovê û li bajarê Danîmarkayê li Kopenhagê. Her ciyâna gişî ya ku Parlamentoye Kurdistanê li welatekî pêk dianî, dibû sebeb ku têkiliyên wî

welatî û Tirkîyeyê xera bibin. PKDW, di nava salekê de çalakîyên dîplomatik ên gişîng li dar xistin û ji bo kurdan ji bîryarêng gişîng standin.

PKDW, ji bo ku Kongreya Neteweyî ya kurdistanê were avakirin ji, bîyarek da û ji bo wê ji, komîteyeke amadekar da damezîrandin. Ev komîte, ji bo pêkanîna wê armancê xebatên xwe didomîne.

● 10. 4. 1991 Avrîl

Serhildana Başûrê Kurdistanê ya avrîla 1991'an, ji aliyê hêzên dewleta Iraç ve bi êrîşke hovane hate perçiqandin. Bi hezaran kurdên Başûrê Kurdistanê koçberî Tirkîye û Fransê bûn. Pişti avabûna hêza çakûç, piraniya wan, vegerîyan başûrê Kurdistanê.

AWIR



ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



Girîngiya berhevkirin û vejandina folklorê

Folklor, wateyeke xwe ya gelek berfireh û dewlemend heye. Mirov dikare ji edet, ji bermayî, berhem û jiyana hezar salan re folklor bibêje. Di zimanê ewrûpî de "folk" bi wateya "xelk" e. "folklor" jî dibe berhemên gel an ji jiyana gel. Folklor, ansiklopediya bawerî, jibermayî û parastina kultureke kevin e. Ji ber ku tirk wateya folklorê bi şasî bi kar tînin, em kurdên bakur ji, wekî tîrkan bi kar tînin. Yanî folklor ne bi tenê gerandina govendê û gotina çend stranan e. Folklor her aliyê jiyana gel e. Ji ber vê yekê mirov dikare hem vê mijarê baştır veke û hem ji girîngiya berhevkirina berhemên folklorî bide diyarkirin.

Bingeha ziman û edebiyata neteweyî li ser berhemên folklorîk ên bi hezaran salan tê avêtin. Ew neteweyen ku hîmê ziman û edebiyata xwe li ser berhemên folklorîk ava nekin, seqet û nexwêş dimîn. Ewrûpî ji 400 sal berî niha ve, dest bi vî karî kirine û ziman û edebiyata xwe ya kevin û ya nûjen li ser vê yekê ava kirine. Mesela Swêdî di sala 1632'an de, dest bi xebata berhevkirina berhemên xwe yên folklorîk kirine û pişt re wê xebatê, bi navê Akademiya Swêdê heta iro didomîn.

Îro hewcedariya me bi xebat û dezgehêni wiha heye. Akademî û enstîtuyen me divê xebatêni wiha bi program û proje bikin. Di demeke nêzîk de berhemên folklorîk ên kurdan ên hezar salan ji bin axê û ji ser ziman bigirin berhev bikin. Mirov dikare xebata berhemên folklorîk wiha bi sernivîsan rêz bike: 1) Navêcogrî: Navêcogrî gund, bajar, çiya, deş, newal, gelî, çem... 2) Jîyan li gund û bajaran, 3) Mîmarî û malzemeyen xanî û avahîyan. Nav û bikaranîna wan, 4) Tîşîn navmalê û bikaranîna wan, 5) Xwedîkirina heywanan li gorî demsalan, berhemên ku ji heywanan tê, 6) Çandinî: Cotkirin, çandin û çinîn, bêder rakirin, 7) Nêçîr û nêçîrvanî. Dem û cureyên nêçîran, alet û çekên nêçîrê, 8) Navêcogrî mirov û heywanan bi kurdî, 9) Rez û bexce: Xebat û berhemên ku ji wan têyek bi yek, 10) Xwarînê kurdî û amadekirina wan, herêm bi herêm, hişkirin û hilanîna xwarînê zivistanê, 11) Navêcogrî giya, kulîlk, dar û beran, 12) Cil û berg: Cilên mîr, jîn û zarakan, li gorî her herêm û her demsalê, 13) Senetê bi dest: Çekirina xirc, kilîm, çerm, xalîce, caw, oberî, meşref.. Cîr, dîzik, tembûr, tifing, dolab, dergûş, gîsin, das, bîvir.. 14) Pîvan: Kurdan berê dirêjahiye bi ci pîvane û giranî bi ci pîvane? Wekî tuxt, weqî, bihost, gav û hwd.. 15) Bûyîna zarakan, nîşan, next (qelend), dawet, zayıf, jînberdan, şîn, cejnîn neteweyî û yê dînî, 16) Edebîyata gel: Mîtolojî, destan, stran, xebroş, çîrok, mamik, lihevhâti, lezgotin, gotinîn pêşîyan, dua, nîfir, biwîj (deyîm), pêkenîn, lîstikîn zarakan, gotinîn argo... 17) Amadekirina ferhengîn zarava û devokên kurdî.

Belê, berê li Sovyeta kevin û di van salêni dawiyê de ji, li Swêdê, di vî warî de hinek xebat hatine kirin û berdewam in ji. Lî ev xebatêni şexsi ne. Ji aliyê din ve, ew kesen ku bi van karan ve dadikevin, bi xwe zanebûna wan têrî nake. Hema ci bi destê wan dikeve berhev dikin. Bêplan û proje ne. Haya yekî ji yê din tune. Wekî ku min li jor nîşand, di her war û şaxî de xebat tune ye. Di xalek-du xalan de xebat têne kirin. Ev ji bi piranî berhevkirina çîrok û stranan e. Gencîneya (xezîneya) zimanê kurdî folklora kurdî ye. Pêwest e ku her sazî û kesen kurd li ser vê yekê baş bifikirin. Ev, karekî rîxistinî, zanyarî, dîsîplîn û ser û beriyê dixwaze. Divê baş bê zanîn heta ku ev yek pêk neyê, zimanê kurdî ji tu car, nabe zimanekî nûjen û dewlemend!

Kurd keda erzanîn

Panelâ Enstîtuya Kurdî bi navê "Li Kurdistanê Guherînên Sosyolojîk" li NCM'ê roja 30'yê avrîlê çêbû. Birêveberiya panelê, zimanzer Feqî Hüseyin Sağnîç kir. Kesen ku wekî axaftavan ji bo panelê hatibûn dawetkirin ev bûn: Dîrokzan Dr. Cemşîd Bender, Nivîskar Faik Bulut, Serokê İHD'ê Ercan Kanar, ji TOHAV'ê Parêzer Bedia Buran, Nivîskar Altan Tan, Sendîkavan Münir Ceylan, Dîrokzan Torî û Nivîskar İsmail Göldâş. Ji wan Dr. Cemşîd Bender û Faik Bulut besdar nebûn, Ercan Kanar ji ji ber hebûna karê xwe bi mesajekî lêborîna xwe xwest.

Pêşî ji TOHAV'ê Parêzer Bedia Buran li ser rewşa psîkolojiya zarokên kurd û qanûnen ku mafêñ zarokan diparêze û dewletê li gorî peymana Cenevreyê imza kirine axaftinek kir. Wê diyar kir ku dewlet ji qanûnen, madeya 29'an û xalîn wê bi kar nayîne. Li gorî wê, dewlet ji bo ku zarokên kurd bi zimanê xwe yê zikmâkî perwerdehiyê nebînin vê madeyê bi kar nayîne. Li hêla din da zanîn ku zarokên kurd di nava ser de dijîn, tesîra ser psîkolojiya zarokan xerab dike, ev ji aliyê sosyologan ve ji hatîye îsbatkirin.

Bedia Buran bal kişande ser mehkeme-yen ku ji bo zarokan çêkirine û îşkenceyê ku li zarokan tê kirin ji, wê got: "Dîsa dewlet bi awayekî qanûnen xwe dide bin piyan. Li Tirkîyeyê 5 heb mehkemeyen zarokan hene, lê zarok li DGM'yan têne darizandin."

Piştî wê, li ser di dema neolîfîk de olên kurdan û cihê ku kurd lê jiyane û lê belav bûne, bi lêkolînen xwe yên taybet Dîrokzan Torî axivî. Dîrokzan Torî di şikeftan de resmîn ku li Mezopotamyaya Jorîn hatine çeki-

**Dewlet politikayê taybet bi kar tîne.
Ew dixwaze kurdan ji xwe re wekî quweta kedkariyê bi kar bîne.**

milê kirin, kuştin, îşkenceyê ku osmanî li kurdan pêk anîne, xwend. Ji xeynî nameyê, wî ji hin dîrokzan û gerokên biyan ku pirtûk li ser kurdan nîşandine, pasajîn xwendin.

Sendîkavan Münir Ceylan ji, li ser têkoşîna çînayetiye ya li Kurdistanê rawestîya û wiha axivî: "Li Kurdistanê dewlet politikayê taybet bi kar tîne. Ew dixwaze kurdan ji xwe re wekî quweta kedkariyê bi kar bîne, ziman, çand û hunera kurdî qedexekirin, vê armancê derdixe holê. Ew dixwaze têkoşîna çînî ya li Kurdistanê ji, li gorî ku politikaya wê daniye, bimeşe. Ji ber vê yekê ji kesen ku li hemberî vê politikayê dertêni ji ceza dike."

METİN AKSOY

Ji devê Enver Aytekin çîroka 23'yan, ku ew bi xwe jî yek ji wan e

Dîrok lii kastiyâ xwe digere



Ji aliye çepê ve rêza pêşin: Enver Aytekin, Cenap Karakaya, ?, Dr. Nuran Bozer (Akşit), rêza paşin: Veysel Akkaş, Vecdi Özgüner û Gönül ?, di sala 1950'an de ji ber ku efûkirina Nazım Hikmet xwestine têne mehkemekirin.

PORTRE / ENVER AYTEKİN

Enver Aytekin, di sala 1927'an de li navenda Sêrtê hatiye dinyayê. Diya wî ji Eşîra Elîkan, bavê wî jî, ji Eşîra Aşitan e ku ji mêm ve ye ji Hesenkêfê hatine û li Sêrtê bi cih bûne. Hê jî hin lêzimên wî li Sêrtê dijîn. Ew bi xwe ji sala 1965'an û bi vir ve neçûye Sêrtê, feqet qeyda wî ya nifûsê hê jî li ser Sêrtê ye.

Aytekîn dibistana pêşîn û navîn li Sêrtê, lîse jî li Amedê temam dike. Zanîngeha Hiqûqê jî li Stenbolê dixwîne. Lê ji ber "muhil-î şeref" ango "jî ber ku li dijî rûmeta pîşeyê kar kiriye", rê li ber wî hatiye girtin û tu car nikaribûye ebûqa-tiyê bike.

Enver Aytékîn, cara yekemîn; di 1946'an de ji ber Partiya Kedkaran (Emekçi Partisi) tê binçavkirin. Cara duyemîn jî, di civîna ji bo efûkirina Nazîm Hikmet de, tevî 7 hevalên xwe di sala 1950'yan de tê girtin û 6 mehan li Girtîgeha Sultanahmetê dimîne. Wî li ser vê mijarê serpêhatiyek xwe ji me re got:

"Komeleyeke me bi navê "Komeleya Ciwanê Perwerdehiya Bilind" hebû. Rojekê ji bo efûkirina Nazım Hikmet, me bi hevalan re civînek li dar xistibû. Polîsan jî êrîşî ser vê civînê kiribû û der heqê 8 kesan de tehkîqat vebûbû. Pişî mehkomemeyê ceza li me hate birîn. Me biryar temyîz kir û şande mehkomemaya bilind (yargitay) da ku careke din lê bînêrin. Yargitayê biryara ceza rakir. Dosyaya me hat mehkomemeyê, lê mehkomemeyê dîsa eyñî ceza da me. Îcar dosyaya me şandin heyeta giştî. Wê jî biryara mehkomemeyê xera kir û mehkomemaya me jî bi vî awayî xelas bû. Wê demê li vê dozê bi navê Nefî Beg dadgerekî bi nav û deng dinihêrt. Îcar Nefî Beg li pey mehkûmkirina me bû, wê çaxê.

Piştî cênd salên din, rojekê li ber weşanxaneyê (li Cağaloğluyê, Sosyal Yayınlar) ez dam sekinandin. Gerçî min ew nas dikir ka kî ye. Ji min pirsî got: 'Navê we Enver Beg e?'

Min jî got: 'Belê'. Dû re dewam kir: 'Enver Beg! Di wê tarîxê de bi neheqî min biryara mehkûmiyeta we dabû. Feqet şertên wê demê wisa bûn. Li ser me jî gelek zordarî hebû û me jî zêde jî wan tiştan fêm nedikir. Gelo ku ez jî we îstirham bikim, hûnê min efû bikin?' Min pişa wî mist da û jê re got: 'Musterîh bin ku me ew tişt jî bîr kiriye jî.' Dû re got: 'Hûn hevalên xwe yên din jî dibînin gelo û hûn dikarin vê daxwaza min ji wan re jî bibêjin?' Min got: 'Belê. Ez wan dibînim û li ser navê wan dibêjîm ku hûn musterîh bin û tu kîna me iî li hemberî we nîn e.'

Piştî mehkemeyê bi qasî 20 sal derbas bûbûn herhal. Ev tiştekî gelekî xweş bû, ji aliyê Însanetiyyê ve."

Aytekîn di sala 1963'an de jî tevî 22 kesan (di dîrokê de ev bûyer mîna 23'yan tê zanîn) tê girtin. Serpêhatiya xwe ya 23'yan jî jixwe bi firehî ji me re behs kir.

Enver Aytekin, bi Aziz Nesin û Kemal Tahir re, beriya sala 60'î dest bi karê weşanê dike û bi hev re Weşanxaneyâ Düşün ava dîkin. Piştî demeke din, dev ji karê weşanê berdide û rojnamevantiyê dike. Li gorî gotina wî, pêşî li Rojnameya Tamimê dixebite. Di sala 1962'an de jî bi Edip Karahan re rojnameya Dicle-Firatê derdixe. Ji aliyê resmî ve kar û barê rojnameyê Edip Karahan dimeşîne. Aytekin jî bi navê 'Ahmet Botanlı' nîvîsarên xwe di vê rojnameyê de teví yên Edip Karahan, Musa Anter, Yaşar Kaya, Dr. Sait Kırmızıtoprak û hwd. diweşîne. Ev kovar, piştî ku 8 hejmar derdi-keve, weşana xwe di 1963'yan de dide sekinandin.

Weşanxaneya Sosyalê jî di sala 1962'yan de ava dike û ev weşanxane 34 sal e ku kar û barêñ xwe bi rêkûpêk didomîne. Li gorî gotina Aytekin, li vê weşanxaneyê pêşî pirtûka nivîskarekî îngilîz, bi navê "Sosyalîzm" çap dibe, bi mebes-ta hînbûna tewra dewletê, ya li hemberî weşankariya kur-dan.

**Ev demek e ku em bi
armańca eşkerekirina dîro-
ka nêzîk a kurdan xebatêñ
lêkolînî di rojnameyê de
diweşînin.**

Vê heftiyê jî hevalên me

AYNUR BOZKURT


DÜZGÜN DENİZ bi Enver
Aytekin re -ku wî bi xwe di
nav bûyera 23'yan de cih
girtibû- hevpeyvînek
çekirin. Em ji devê wî
mijara 23'yan diweşînin

Di sala 1963'yan de ez û Edip Karahan me biryara derxistina kovarekê da. Dû re ji me kovara "Dicle-Fırat" derxist. Berpirsê kovarê Edip bû. Di vê kovarê de tevî me, heval û nasên me yên kurd jî dinivîsandin. Di hejmarâ duyemîn de min nivîsarek bi sernavê "Doğu Meselesi" bi îmzeya mustear "Ahmet Botanlı" wesandibû.

Piştî derketina hejmara 4'an jî 5'an, di Rojnameya Cumhuriyetê de nivîsareke bi işaretə sê stérk (**), li ser kovara me derketibû. Ew nivîs bêimze derketibû, lê dû re em hîn bûn ku bi wê işaretê Berpirsê Kârên Nivîsaran Cevat Fehmi Başkurt nivîsaran amade dike. Di wê nivîsê de tê gotin ku "heke nivîsên bi vî rengî werin weşandin, wê di demeke nêzîk de ji Rojhilat dengê top û tifingan were" (qesta wî nivîsaran min a bi navê "Doğu Meselesi" ye). Piştî wê nivîsa Başkurt, Kumandarê Artêşa Sê-yemîn ji Erziromê telefonî rayedarêne li Stenbolê dike û zorê dide wan ku kovara me were girtin. Dû re em hîn bûn kû Cevat Fehmi Başkurt weki Berpirsê Stenbolê ya Teşkilata Emniyeta Neteweyî (MIT) xebatê dike. Li ser vê yekê dozger der heqê me de dozê vedike û rojekî ji bo ifadeyê gazi me herduya kirin. Tabî me wisâ li hev kîribû ku, mijar ci dibe, bila bibe berpirs Edip e û mesûlîyet li ser min nîn e. Pêşgazî min kirin, ji min pirsîn ka "Ahmet Botanlı kî ye", min jî got: "Berpirs li derive ye jê bipirsin." Piştî demeke din gazi Edip kirin û ifadeya wî standin. Careke din gazi min kirin, gotin: "Hevalê te qebûl kîriye ku te ew nivîsar hazir kiriye." Lê min dizanibû ku ne rast dibêjin, min ew yek qebûl nekir. Dû re bi qasî 10 mehan ceza li Edip hate birîn.

**Eleqeya nivîsa min
û 23'yan**

Vêga hûnê bibêjin ku ci eleqeya vê bû-
yerê û 23'yan bi hev re heye? Pêşî me ji-
tiştek nizanibû, lê dû re derket holê ku ele-
qeya bûyera 23'yan bi vê yekê re ji hebû-
ye.



Îcar wê demê di 1963'yan de bi taybeti li Stenbolê orf-î idare (rêveberiya leskeri) hate îlankirin. Pişti wê jî em 14 hevalên kurdên ji Tirkiyeyê Hasan Buluş, Enver Aytekin, Edip Karahan, Ergun Koyuncu, Ali Anagür, Kemal Bingöllü, Mehmet Bilgin, Fethullah Kakoğlu, Doğan Kılıç Şıhhesenanlı, Musa Anter, Ziya Şerefhanoglu, Yaşar Kaya, Medet Serhat, Sait Elçi, tevî 9 xwendekarên kurdên Iraqê Abdulsettar Hemawendî, İbrahim Mamxidir, Xazî Dizeyî, Nejad Remzî, Fuad Derwîş, Talat Şerif Muxtar, Seîd Ebdurrehman, Cemal Alemdar, Fîrûz Felahat hatin binçavkîrin. Pêşî em birin Girtîgeha Harbiyeyê ya Leşkerî. Deh rojan em li wir man. Dû re gotin ev der ne musaît e, em şandin Garnizonâ Balmumcuyê. Em li wê derê bi qasî 2-3 mehan man. Car caran em dibirin ba dozger ji bo agahiyan. Lê şekek saet li dora 12'ê şevê, zabit hatin tevî min, Yaşar Kaya û Ali Anagür birin ofisa midurê girtîgehê. Li wê derê me dît ku gelek zabitên hêzên hewayî û kesen sivil rûniştine. Min ji meseleyê fêm kir. Ji ber wê min ji midur re (albay) got: "Em vêga di bin berpirsiya te de ne. Di qanûnê de tê gotin ku, kesen di bin berpirsiya girtîgehê de bin, ji her tiştên ku bêş serê wan, rayedârên girtîgehê mesûl in. Hûn nikarin me teslimî kesen nediyar bikin."

Deriyê Zîverbeyê kurdan vekir

Albay bi ser min de qîriya. Edî tiştik dest me nehat. Em li sê erebeyan siwar kirin. Ji wir jî birin Lengergeha (iskeleya) Kabataşê, em derbasi aliye din bûn. Dema ku em gihîstîn wî alî, çavên me hate girêdan. Dîsa bi wan erebeyan birin cihekî din. Ew cihê ku em lê sekînîne nava bajêr bû, cihekî zehf tenha bû. Dû re ein hîn bûn ku, ew der Koşka Zîhîpaşa bû. Nemaze bi navê Zîverbey tê naskirin. Wê çaxê haya me ji kontrgerîla falan tune bû. Belkî kontrgerîla hebû, lê me hîc nebihistibû. Edî ew hîs bi me re çebû ku ev tişt ne normal e. Dû re, em di nêrdewanekê re dakerin odaya jî ku pace jî tê de tune bû. Çavên min vekirin, lê hevalên min ne li ba min

bûn. Yaşar û Ali biribûn cihekî din. Di wê odaye de bi tenê maseyek hebû. Pişti demekê din yekî sivil (ev jî albayekî ji Erziromê bû) hate ba min, da ku ifadeya min bistîne.

Di bin ronahiya projektorêne taybet de dixwest ku bi min hin tiştan bide qebûkirin. Li ser wan pirsên eletewş min jê re got: "Ku tu pirsên bimantik ji min bipirşî ezê bersivê bidim, lê ku tu wisa nekî, ez jî tiştîkî nikarim bibêjim. Ger tu zorê li min bikî, ew tiştîn ku ez bibêjim jî, ewê tev derew bin û ew jî bi kêri we nayê."

Li ser wê tewra min, rengê pirsên wî guherîn. Edî navê hin hevalên min ji min dipirşî. Min jî digot: "Belê, ez wan kesan nas dikim. Hin ji wan hevalên min ên mektebê ne, hin ji wan jî, ji welelît nas dikim û têkiliyê me jî hene." Dawiyê ji min pirsî: "Ahmet Botanlı kî ye?" Min jî jê re got: "Me bersiva vê pirsa te jixwe berê dabû. Yekî din an jî ez, ci ferq dike ji bo we? Ma hûnê ji ber nivîsekî min bi dar de bikin?" Pişti 2-3 saetan, ku ifadeya min xelas bû, ew jî çû, dûre Yaşar û Ali anîn ba min.

Pişti ku pirsiyarkirina kontrayan xelas bû

Demek bi sûn de, yekî din hat û ji me xwest ku em xwe tazî bikin û bi tena bi derpi û fanorî bîmîn. Me cilêن xwe danê û di wê seqemê de, me sibeh anî. Serê sibê wan bi xwe cilêن me anîn û dan me. Pişti 8-9 rojan, gardianek hat û got ku amade bin û hûnê herin. Min wisa bawer kir ku tehkîqat xelas bûye û em tê berdan. Feqet erebeya ku em tê de bûn, çawa ku here Balmumcuyê, lê pişti demeke din riya xwe zivirand û berê xwe da Girtîgeha Orhaniyeyê. Ji ber ku hevalên me hê li Balmumcuyê bûn, nedixwestin ku haya wan ji rewşa me çêbe. Hevalên me yê din jî wekî me ji van merhaleyen derbas bûbûn û dû re jî ew anîbûn Girtîgeha Orhaniyeyê.

Pişti sê mehan em dîsa birin Balmumcuyê. Jixwe mehkemeya orf-î idareyê jî qerara bêselahiyetiye da û pişti rojekî din em bi balafirê kargoyê şandin Enqereyê. Li wir em birin Yekî

neyen Hêzîn Zirxî. Çend mehan em li wir man. Ji ber ci bû, em nizanîn, lê ji me re hate gotin ku, ev der ne musaît e û ji wir em şandin Mamakê, Dibistana Ziman û İstixbaratê. Em xistin qawîşekê ku li kîleka qawîşa Talat Aydemir (yek ji cüntaxwazîn Tirkiyeyê bû) û hevalên wî bû. Herî zêde em li wir man. Pişti 8-9 mehan idianarme ji me re şandin ku doza me li Genelkurmayê wê were dîtin. Dawiyê em derketin mehkemeyê. Wekî ku me rîxistînek ava kiri-be em tê darizandin. Em hê li Balmumcuyê bûn, hin xwendekarêne kurd ên Iraqê jî anîbûn ba me. Hin ji wan li tipî, li iktisadî û hwd. dixwendin. Dû re dîmeneke wisa derxistin holê ku, wekî me bi wan re rîxistînek çekiribe, ji bo avakirina dewleta kurd a serbixwe. Îcar tiştîkî enteresan heye. Yekî bi navê Hemawendî -ji kurdên Iraqê - heye ku ew bi xwe û hevaleki me Doğan Kılıç, bûne sebeb ku em werin girtin. Gava ku em ketibûn xebata kar û barê weşankariyê, Doğan jî bi serê xwe bi Hemawendî re ketiye têkiliyê. Lê belê haya kese-kî ji me tune bû.

Serlistikvanê bûyera 23'yan: Hemawendî

Hemawendî zilamekî zehf cihêreng bû, bi dîtîna min wî hînî rojnamevan-tî dikir, lê ji xeynî vê jî, wexta ku iktidara Nurî Saït Paşa li Bexdayê bûye, ew ji wan re ji bo temînkirina jinan xebitiye, yanê li min bîborin produktoriya seksualîteyê (qewadî) kiriye. Dema ku General Qasim iktidarê bi dest dixe Hemawendî jî, ji wir direve, diçe Lubnanê. Dixwaze ku ji Lubnanê derbasi Tirkiyeyê, ji wir jî, di ser Iranê re here Kuveytê. Rojekê li Lubnanê radyoya xwe dide tamîrê (ew insanekî wisa bû ku her tim bi teçhîzat digeriya, yanê ci tiştîn elektronik hebûna bi xwe re digerand, mîna radyo, televîzyon û hwd. Heta cara yekemîn min televîzyon li ba wî dît) û li wê derê bi tesadûfi rastî Baytar Nûrî (M. Nûrî Dêrsimî) tê. Pê re têkiliyê datîne û ji Baytar Nûrî re behsa çûyîna xwe ya Stenbolê dike û jê alîkariyê dixwaze. Baytar jî navê rehmetî Musa Anter û navnîşana wî didê. Lê dema He-

mawendî tê Stenbolê, çawa dibe nizanîm, navnîşana Musa Anter peyda naake û bi tesadûfi bi Doğan Kılıç re hevnasîna wan çedibe û têkiliya wan xurt dibe.

Pişti çend rojê din Hemawendî û Doğan bi hev re dîçin Konsolosxaneyâ Israîlê da ku alîkariyê ji wan bixwazin. Xwedêgiravî alîkariyê ku ji Israîlê bîstînin, wê bişînîn Iraqê. Randevûyekê bi wan re eyar dîkin, lê yekî ji Emniyeta Neteweyî ya Tirkiyeyê tê randevûyê. Ew kes çawa dikeve navberê, edî ew nayêzanîn. Belkî Konsolosxaneyâ Israîlê agahî dabe û gotibe "du kesen ku ci tişt in, ne belî ne, hatine û alîkariyê dixwazin" falan. Cihê randevûyê jî li 'Taşlik'ê ye, berê qehwexaneyek û mala İsmet Paşa hebû li wê derê. Ew hê jî hene ez nizanîm. Memûrek tê wê derê -ji MİT'ê ye- dibêje: "Temam emê alîkariyê bidine we, lê hûn ci ne, ci kes in, hûn kê temsîl dikin? Bégumanl rîxistîneke we jî heye?" Ez dibêjim qey Doğan Kılıç bersivê dide -çunkî Hemawendî Tirkiyeyê falan nas nake, nikare wisa bersivê bide- dibêje ku: "Rîxistîna me tune, lê di nêzîk de wê çêbe."

Doğan Kılıç insanekî wisa bû ku her kesî, xwe jê dûr digirt û bi taybetî ez. Mesela dema min ew bidîta min riya xwe diguherand. Doğan tevî min navê 14 kesan daye wî kesî. Tabî ev bû fer-sendeke geleki baş ji bo wan. Pişti tehkîqat û darizandinê falan, derket holê ku ev tev, tiştîn xeyalî ne, lê ev tişt bi bihayekê giran li me bû bar. Xelasbûna me ya ji vê bûyerê jî, hînî enteresan e. Li Mamakê di celseya yekemîn a mehkemeyê de me itiraz kir. Me got ku ev mehkemeyê nikare li vê dozê binêre, rayeya wê tune ye. Çunkî di nav me de kesen ji eskeriyê nîn in û tu eleqeya wê bi orf-î idareyê re jî tune. Armanca îlankirina orf-î idareyê jî geleki bi sînor e. Tenê ji ber bûyerê 21'ê Gulanê, orf-î idare hate îlankirin."

Ji madeya 125'an em dihatin darizandin

Dema min wisa itiraz kir, hevalên ji Iraqê gotin: "Kekê Enver tu ci dikî?" Wan wisa bawer dikir ku, wê werin berdan. Dû re heyeta mehkemeyê hînî navber da mehkemekirin û dîsa hatin. Itiraza me qebûl kirin û bîryar dan ku, tu rayeya mehkemeyâ Genelkurmayê nîn e ku li vê mehkemeyê binêre. Li ser vê yekî em carekî dîm şandin Stenbolê, da ku mehkemeyeye sivil çekin. Pêşî em birin Girtîgeha Leşkerî ya Orhaniyeyê, ji ber ku li Girtîgeha Sultanahmetê cih nemabû. Gerçî pişti demekê, em şandin wê derê jî. Li mehkemeyâ Cezayê Giran a 5'emîn, ji madeya 125'an em hatin darizandin.

Dihat xwestin ku em werin dardekirin, lê ji xeynî Hemawendî û Doğan Kılıç tahliyeya me xwestin. Dû re jî gotin: "Ji aliye ewlehiya pergala civakî ve ne rast e ku li Stenbolê ev mehkemeyê çêbe." Îcar doza şandin Enqereyê, mehkemeyâ Cezayê Giran a 2'yemîn. Dawiyê li vê mehkemeyê ji xeynî Doğan û Hemawendî (li wan 10 mehceza hate birîn) me beraat kir û em hatin berdan. Vê pêvajoyê 11 mehdomandibû û ji ber ku em bi teinamî 23 kes ji wê dozê hatin darizandin, ev bûyer wekî "Bûyera 23'yan" kete dîrokê.

Zimanê arî ji Zagrosan li Ewrûpayê belav bûye

Dîrokzan Cemşîd Bender “Zimanê arî ji Zagrosan li Ewrûpayê belav bûye”, dibêje û koka kurdan bi huriyan ve girê dide. Li gorî wî, kurd li gelekî kevnare yê Zagrosan e. Kurdan li vê heremê, çinîn û çandînî kirine; sewal kedî kirine; bi navê dewlet ava kirine.

F. ALİNO pê re pevivî.

Birêz Cemşîd Bender, hûn bi xebatên xwe yên dîrokî yên li ser kurdan têr naskirin. Ji kerema xwe re hûn dikarin der heqê koka kurdan de ramanên xwe, bi kurtî ji me re bibêjin?

– Kurdan, ji berbanga dîrokê heya roja ku em tê de ne, li Zagrosê cih girtiye. Ne gelekî ku jî derve hatiye vir û cih girtiye. Gelê kurd bi xwe, xwediyê axa Zagrosê ye. Li gorî min xwediyê Zagrosê yê ewil civaka gutî ye. Min bi xebatên xwe, bi lêkolînên xwe yên zanistî ev destnîsan kir. Subarî û lulubî beşek ji vî gelîne. Dibe ku subarî, navekî erdînîgarî be jî. Ancax, di dema dîrokê ya nivîskî de, gutiyan, di dawiya 3 hezar salî de (B.Z) mîna kalikên xwe 125 salî serwerîti kiriye.

Di navbera salên 2000 û 1000 (B.Z) de gelê kurd, bi navê qasît û mîtanî dewlet ava kirine. Çend sal pêş de, ûrartû û med bi xurtî derketine ser qada dîrokê. Hemû dîrokzan baş dizanîn ku, gelê ûrartu neviyê huriyan e. Ev jî, ji vê dibizire ku gutiyan mirovahî ji şikeftan derxistine, dest bi çinîn û çandînî kirine, sewal kedî kirine. Bi vî awayî mirov bûye eşrefi mehlûqat. Ji ber vê yekê, ji bo ronîkirina dîroka kurdan pêwist e ku li ser gutiyan lêkolînên qenc çêbin

Ji ber van sedeman em gutiyan ji dema neolitîkê heya kalkeolitîk digirin û di dîrokê de cihê wan ci ye, bi zanistî li ser wê yekê lêkolînan çêdikin. Mirov dikare bibêje nûnerên Serdema Sifirê (pexir) û serdema Hesin dîsa ji kurdên huri ne û neviyên wan in. Vêga di nava 2000 salî de li holê, ji ber ku gutî tune bûn, qiralen asûriyan mîtanî, qasît û ûrartû wekî gutiyan hesibandin.

Qiralê Asûr Salmanazar piştî gutiyan, di 900 salî de wiha dibêje: “Mîna stêrkê vêketiye gelê gutî, vêga ne bi piranîtiya xwe, bi cehd û tundiya xwe, bi toqîn û bi rûxantiya xwe jî hatine naskirin. Neyartiya wan li hemberî min jî domiya.” Salmanazar piştî şerîn ku kiriye jî wiha dibêje: “Jî sînorê Araratê heya Tur Abîdînê xwîna gutiyan mîna avê herikiye”

Dîsa Qiralê Asûriyan Tiglatpileser (1112–1079) berî çêbûna İsa bi 1100 salî di kîtabeyekê de wisa da ye nivîsandin ku li hemberî gutiyan gelek serkeftin kesibandiye an jî bi dest xistiye..

– Hinek dîrokzan dibêjin ku kalikên kurdan med in. Li gorî van dîrokzanan meden ku bi zimanê arî dîpeyivin ji bakurê Ewrûpayê hatine. Li ser vê yekê hûn ci dibêjin?

Fikir û ramanên ku dibêjin med ji bakur hatine Zagrosê iflas kiriye. Li gorî belgeyên arkeolojîk, medan koçberiyeke wisa nekiriye û ji devekerke din nehatine Anadolê, ev rind hat fêmkirin. Çandînîye li Zagrosê pêşî dest pê kir. Li nav Ruha û Samsatê kolaneke arkeolojîk çêbû û Newala Çorî hate dîtin. Newala Çorî, vêga tê zanîn ku bajarekî çandînîye yê herî kevn e (Ev kolan di sala 1983'yan de çêbû).

S.İzzet Güven, (Li ser tezîn Cemşîd bender) wisa

dixâive: “Sê heb zimanzanê swêdî bi şîrikatî pirtûkek weşandine û li ser zimanê me dibêjin ku, Dihat bawerkirin ku zimanê Hînt-Ewrûpî berê li nava stepêr rûs, li hêla Başûr derketibû holê. Ev ziman bi barkirina hinek civakên êrîşkar li Anadolê û Ewrûpayê belav bûbû. Vêga berî ku ev koçberî biqewime, li Zagrosê hem çandînî û hem jî zimanê Hînt-Ewrûpî hebû û dihat axaftin” (S.İzzet Güven, Özgür Ülke 20.12.1994)

Heta niha mîsyoneke wisa li ser kurdên med hebû, ku ew ji başûrê ûris ji nav çolteran bar kiribûn û zimanê Hînt-Ewrûpî bi vî awayî belav bûbû.

Bes ev tezeke çewt e û vêga nema tê pejirandin. Di demeke nêzîk de ji Zanîn geha Cambridge Pr. Colin Renfrew û Gînedeyê Enstituya Rojhîlat û Zanyarê Gürçistanê Thome Gamkrelidze, der heqê vê mijarê de her yekî pirtûkek nivîsandiye. Van her du nivîskaran, di kovara navdar a ku li Amerîkayê diweşe, Scientific American de, her yekî gotarek nivîsandiye û ji tezên wan i zanistî tê fêmkirin ku, zimanê kurdi bi çandînîye re derketiye holê.

Di van salên dawîn de li Zagrosê gelek kolanên arkeolojîk çêbûne û bi saya wan pir çewtî sererast bûne. Yanê berî her tiştî hate pejirandin ku zimanê arî li Anadolê û Zagrosan derketiye holê.

Me wekî dîrokzanê kurd, berî van her du nivîskaran ev rastî gotibû û tesbît kiribû. Me bi saya lêkolînên xwe fêm kiribû ku, zimanê arî berî koçberiya medan a ku ji bakûrê ûris pêk hatibû, li Zagrosê derketibû holê û pê dihat axaftin. Bermayıyên vî zimanî di gîhejin dîroka dema zû û berî İsa bi 2000 salî. Dema wê ya dereng jî digihije berî İsa 3000 salî. Gava ku zimanê arî berî İsa bi 2000 salî ji derve latibe Zagrosê bi koçberiyê, wê koçberiyeke herî mezin çêbûbûya û şopa vê koçberiyê, wêbihata xuyakirin an jî dîtin.

Prof. Götz, Arkolog E. Forer, Paul Krestschmer, L. K. Palmer, Prof. Bilge Umar dibêjin ku koçberiyeke wisa çênebûye.

Nemaze Arkeolog û Dîrokzan K. Bittel dibêje ku idiayeke wisa bi belgeyên arkeolojîk nehatiye îspatkirin. K. Bittel û kesen zanyar, li ser seramîk û hestiyê insan lêkolîn çêkiribûn û berî ku zimanê arî derkeve holê û gava ku derketibû holê jî bi tu awayî, ne li aliye Trakyayê, ne jî li aliye Kafkas û Kurdistânê ber bi Zagros û Anadolê koçberiyeke êrîşkar, tundî û rûxanî çênebûye.

Bûyera koçberiyê an ji nav çolteren ûris derketiye holê, li Almanyayê di dema Hîttler de ji aliye Mirov Zanyar Fitz Schochermeyr hatiye idiakirin. Hîngê Hîttler dixwest li Ewrûpayê nişîmanekî dayik zeft bi ke, ji ber vê yekê jî armansa wî bilindbûna nîjada alman bû. Bi taybetî da gotin ku ji nîjada Îndo-German ji derve hatine Anadolê. Lewme teza Hîttler piştî mi-



rîna wî hat terikandin.

– Hûn nerîna dîrokzan Mehrdad Izady, ya ku dibêje “Tu têkiliyêen Zerdeştiyê bi kurdan re tune ye” ga wa dibînin?

Di rojnameya Cumhuriyetê de lêkolînek derket. Rojnameyeke ku berjewendiyên îdeolojiya fermî di-parêze dibêje, kok û binyada ola zerdeşî bi kurdan ve girêdayî ye. Zerdeş, di dema serweriya medan de ramangirekî navdar bûye.

Ji gutiyan heta kurdên iro, di dîroka filozofiya kurî dî de jî feylozofekî navdar û mezin e. Ez dixawazî vê bîbêjim. Izadî dikare bêje ku tu têkiliyên mîslmantiyê jî bi ereban re tune. Lî ev gotin çiqas dîbi tiştîkî rast? Min di pirtûken xwe de Zerdeş û filozofiyâ wî çiqas pihêt bi şarezatiya kurdi û dîroka kurdî ve girêdayî ye, li ber çavan raxist.

Hevalê min ê nivîskar birêz E. Xemgîn, birêz Siray Bilgin der heqê baweriya zerdeşî de lêkolînen xwe weşandin. Ez pêşniyaz li Izady dikim, bila van pirtûkan bixwîne. Gelê kurd, heta misilmantiyê, yanê 1200 salî bawerî bi Zerdeştiyê anîye.

Piştî misilmantiyê, kurdên ku ji ber sûrê İslâmî flîtin û derketin serê çiyan, bi navê alewîtiyê bawerî yên ku ji zerdeşî standibûn, domandin. Kurdên ku li deştan man, bi darê zorê baweriya sûnî pejirandin bûyêr bi kurtasî ev e. Gelo M. Izady, ezidîti û alewîtiqet nekolandiye?

Min di 18'ê pûşperê de berî Konferansa Dîrokê ya Lozanê, li Berlinê kofransek da, têkiliyên ezidîti-alewîti û zerdeştiyê min anî ber çavan. Gava ku têkiliyê zerdeştiyê bi kurdan re tune be, li gorî min têkiliyâ ezidîtiyê û têkiliyâ alewîtiyê jî bi kurdan re tune. Têkiliyâ ku di nava zerdeştiyê û gelê kurd de min dantye ber çavan, bi kurtayî di rojnameya Yeni Politika de weşiya.



NAVENDA ÇANDA MEZOPOTAMYAYÊ bi konseran, bi konferansên li ser sîhemayê û konferansên li ser Peymana Lozanê û çalakiyên hunerî, kulturî, vê hefteyê jî didomîne.

● **7.4.1996 yekşem**

Demjimêr 14:00 Ji Beşa Hunerên Dîbarî ya NÇM'ê; Filmê 'Klamek ji bo Beko'

Demjimêr 18:00, Konsera Los Paşaros

● **10.4.1996 Çarşem**

Demjimêr 18:00, Semînera İsmail Göldâş a li ser Peymana Lozanê

● **11.4.1996 Pêncşem**

Demjimêr 14:00, Komîsyona Çandê ya Komeleya Mafêni Mirovan (IHD) nîqaşa li ser sîhemayê. 'Serdema Sîhemayê tê pirsiyarkirin, Mafêni Mirovan û Sînema, Koçberî û Sînema

Demjimêr 18:00, Konsera Koma Ezginin Günlüğü

● **12.4.1996 În**

Demjimêr 18:00, Konsera Onur Akın

● **13.4.1996 Şemîf**

Demjimêr 14:00, Şanoya Jiyana Nû (Rojbaş)

Demjimêr 18:00, Konsera Ayşegül, Stranen evîniyê

RÛDAN

Kela Nîxolû

dê kîna te jî bibêje

Li Kozanê çiqas eşîretên kurd dijin? Xwediyyê Kîjan navçe, gund, zozan, birc û kelatan bûn? Kîjan gel, ji Kîjan deverê anîn û dan ser milk û warêwan wan? Koçberêna faşilbûyi bi ci awayî ajotin kûstanêna navçeyê Anadolê? Bersiva van pirsan û gelek pirsên din ên girîng di nav rûpelan de bala mirov dikêse û mirovan, dibe 150 salan berî niha.

Apê me yê kal birêz Dr. Abdullah Duman lêkolinek li ser dîroka kurdan dabû min. Nivîskara wê Zeynep Doğan e. Mêjûya kurdan wekî çar besan daye xuyakirin. Gelek tiştên ku hatîne serê kurdan û me nebihistine, di nav rûpelan wê de diyar in. Gelek spas ji birêz Dr. Abdullah re, ku derfeta xwendina wê berhevkirina bi nîx da min. Destên xwişka Zeynep jî her sax bin û êşê nebinin.

Mijara beşa çaran li ser serhildana kurdên Kozanê ye. Bi rastî jî, haya min ji wê berxwedanê tune bû. Bala min kêsa û min gelek tişt ji bo xwe jê girtin. Hêvîdar im, di demeke kurt de bête çapkirin û bi berfirehî bigihîje destê xwendanenê welatparêz.

Li Kozanê çiqas eşîretên kurd dijin? Xwediyyê Kîjan navçe, gund, zozan, birc û kelatan bûn? İmperyalistên îngiliz ji bo ku li wê deverê pembû bidin çandin, kurd çawa bi destê osmaniyan kirin qurban? Kîjan gel, ji Kîjan deverê anîn û dan ser milk û warêwan wan? Pişti Ferma Tanzîmatê yên ku navê xwe danîn "pêşverû" çawa herêm kambax û wêran kirin? Di wê serhildanê de jî tovê dubendî û xiyanetê bi ci awayî di nav berxwedanvanen kurd de, dane belavkirin û reşandin?

Bira çawa kirin dijiminê birayan? Da ku pilingan ji lat û çepêren bilind bînin xwar, ci rîkên xiyanetê bijartine? İslahiye û Osmaniye çawa bûne navçe û kurd bi darê zorê, lê dane bicikirin? Koçberêna faşilbûyi bi ci awayî ajotin kûstanêna navçeyâ Anadolê û kirin mîvan? Bersiva van pirsan û gelek pirsên din ên girîng di nav rûpelan de bala mirov dikêse û mirovê xwendanwjdan û bawerî, dibe 150 sala berî niha.

Hê di wan rojan de rayedarên osmaniyan bi piştevaniya kedxwarên rojavayî, ev herêmîn girîng girtine û nirxandine. Berjewendiyê xwe di valakirina wê kewiya Kurdistanê ya ku vedibe di aliyê rojava de, dîtine. Hatina wan a Kurdistanê ya ku vedibe li aliyê rojava, şkînandi-

na wî dergehê ji pola, ketina wan a Kurdistanê bi hêsanî çêbûye. Lê kurdan jî bi dilekî xweş dest jê bernedaye û bi rûmetî berxwedan kirine; xwîna xwe dane rijandin û xwîna dijmin jî rijandine; serê xwe li ber neyara neçemandine. Careke din xiyaneta di nav de û birakuji li wan bûye mîvan. Dijminê kevnar, ji bo faşilkirina kurdan gelek rî bijartine. Lê rîka gelek feyde jê dîti, disa dubendî û bêtifaqîya kurdan bûye.

Wekî hemû serhildanê kurdan, di Serhilda-na Kozanê de jî xayîn, xwefiroş, kirégirtî, tîrsonek, wêrek, egîd, zana û mîrxas hene.

Hebûna aqilmend û xweşmîrên kurdan serbazê osmanî Ahmed Cewdet Paşa jî înkâr nake. Hin dîtin û bersivêna wan xistine nav bîranînê xwe yên bi navê Pirtûka Marûzatê jî.

Dema berxwedan bi germahî dom dike, paşayê êrişker dixwazin ku berxwedanê bîskênin, ji bo vê Kelata Nîxolû ya xerabe didin avakirin. Kelat li devekerke pir stratejik e û li ser rî rîbârên herêma Şarişê ye. Alîkariya aborî ji Stenbolê dixwazin û dest didin avakirina kelatê. Di nav dîwarêna kelatê yên herifi de, hin kevirên nû, hin jî yên kevnar hene. Paşayê osmanî du rîzîkîn li ser keviran ku bi zimanê yewnamî ne, dide wergerandin. Mijara nîvîsine ev e: İskender li vir zagona darizandinê çêkiriye." Paşa: "Xuya ye ku ev kelata kevnare carekê jî İskender daye tamîrkirin." ji ber ku nîvîs li ser kevirên nû ne.

Lê bersiva qetilê osmanî ya rast û durist çend mehan bi şûn de mezinê Eşîra Ekbaziyan Şêx Ehmed dide. Şêx, li ser daxwaza talankeran rojekê li baregeha wan a leşkerî dibe mîvan.

Careke din guh bidin bersiva Şêx Ehmed ya ku di nav nîvîsinê Ahmed Cewdet Paşa de cih girtiye:

"Paşa!... Di vê deverê de gelek artêş hatin û çûn. Ev artêşa jî dê biçe. Vê Kela Nîxolûye ku kerba İskender got; kîna te jî dê bibêje. Vê ji bîr neke."

TÎŞK

MEDENÎ FERHO



Stûna Neteweyî

Bêguman parlamento, saziya neteweyî ya herî bilind e. Nasname û rûmeta gelan e.... Pîrozî û şâhiya vê avaniyê, ji kar û barê wê û bîryarêne bingehîn ku dibine stûna civata koman, tê. Helbet ev kar û bar bîryar jiyana gel e.... Em dikarin bi dîroka berdewamî jî bi nav bikin. Sedem ew e ku, parlamento bûne "bingeha demokrasi" û bûne "stûna neteweyî." Gelên mezin, her dem bi şîvantî û serdariya kesen çê payidar bûne. Şîvan û serdarê çê jî, her û her bûne rîkûpêkî, bûne xîreta gelê xwe.

Dîroka Kurdistanê, di ava xeşîmî û reştariya demsalan de piraniya caran rîcikên ronahî vekirine. Mixabin ev rîcik nebûne rîbûwar. Rîcik qutebir bûne û ew ronahî jî, bi nicalkeysiyeke mezin, bi derfehatiyeke nemirovanî hatîye tefandin. Tevger qels û misrî, bangê bi awazek korîk berdewam kiriye. Lî iro!.. Bi teganda fîşekan pêşî, ku berî 15 salan dengê wê kete kerika dijminê hov!.. iro heger berdêl pir giran be jî, gişt bûye qonaxake pir bilind ku bi navê "avaniya demokrasi" û "stûna neteweyî" tê şîrovekirin. Edî, gulbengî û gulbijekîn li ser mexetelân virde û kîlîn bînav, di nava tevgera civata cîhanê de, bi rengemîr xuya dîkin. Serderiya şarezayî û şîvantîya bi çognîn zanîstî, bû sedema gavavîtenîn ber dewletî. Lewre jî ji Parlamento Kurdisatanê ya li Derveyî Weleta, hêvî ew e ku bîryarêna ku di civîna giştîya 4'an de hatîne standin, gav bi gav di hêla destûrî de pêk bîn. Ya herî girîng bîryara "bingeha rastmaliya neteweyî" ye. Ji bilî vê, di hêla saziyên kurdî de, ku di riya şoreşa Kurdî de li hemberî gelê xwe, li hemberî dîrokê berpirsiya xwe bînin cih, destûr bête çêkirin. Destûra çapemeniya kurdî jî bête çêkirin, li gorî daxwazên hemdemî bê meşandin. Ji bilî van tevan, pêwistiya mezin li pêşîya PKDW'ê heye. Di seferiya vê şoreşê de, her kurd barê xwe hilgire. Dîroka kurdan, yekemîn car e ku, berxwedana neteweyî bi rîberîyeke xurt didomîne. Lewre jî, hewceyiya destûra leşkerî bi firehî derdikeve hemberî me.

Hêvî û daxwaz, bi giştî û firehî di nava Kongreya Neteweyî de cihgirtina kurdan e. Ew jî, bi têkîlî û danûstandinan çêdibe. Li gorî ragihandinê rojê û taybetî, ew kesen ku berî xwe nedidane Kongreya Neteweyî, bîryarêne tevlîbûnê, standine. PKDW, hewl dide û têkiliyên xurt datîne. Çalakiyên berî niha, yên di bin serokatiya Birêz Yaşar Kaya de hatîne kirin, mînakîn baş in. Lewre jî xweziyê cih daye hêviy... Hêvî jî mezin e. Hêvî her û her dergehê xêrê ye... Lî, tu caran xêr bê berdêl neketîye destêne kesan... Dîroka Kurdistanê, li ser rûpelan spî û bi pêñûsên zérîn tê nîvîsandin.

Ji ber ku nîvîsa Lerzan Jandî nekete destê me, me ya Medenî Ferho di şûna wî de weşand.

Welato ji wan re bibêje!

Welato! Ji wan re bibêje !? ji wan re bibêje ku, welatîmî ne hêsan e, welatînî dilsozi û bargiranî ye, Welato! Ji çiya û zinarêñ xwe re bibêje ku, mirovîn çê di deverên teng de xuya ne... Welato! Tu cih û dem hebûn, sinc û afînandîmî, hebûna te, hebûna welatiyêñ te ye... Welato! Tu pîvan û Terazû yî, tu welatiyêñ çê û neçê ji hev cuda dikî û pîvana welatiyêñ te bi te ye..

Welato! Kes nikare hêza te nas bike û bigihîjê dawiyê, ew hêza ku di ziman û çiyayêñ te de kom bûye, di binax û seraxa te de vesartî ye, di çem û cobârî te de diherike, di mîraniya xaka te de xuya ye...

Welato! Xelkê cîhanê sosretmayî man, dema ku nas kirin "Zerdeş" pêxemberêkî te bû, "Selahedînî Eyûbî, mirovekî te bû, "Dicle û Firat" du çemîn te ne, "Agri û Cûdî" du çiyayêñ te ne. Ji wê hingê ve welato, tu di deriyekî mezin re derbasî dîroka welatîn cîhanê bûyî...

Welato! Ziman nayêñ dizîn, kes nikare zimanê welatiyêñ te bidize, ku ew li zimanê xwe guhdar bin. Lê ku di ser guhêñ xwe re avêtîn û bi zimanê biyaniyan axivîn, wê hingê welato, ne welatiyêñ te xwedî şaristanî ne, ne jî

zimanê wan zimanekî bingehîn...

Welato! Ji wan re bibêje ku, hebûna gelan di yekîtiya zimanê wan de ye...

Welato! Ji wan re bibêje: Ew kesen dudîlî ku bi tenê di roja xwe de diponîjin û li ser malê dînyayê dinûzin, ku weki wan kesan wê di nav pêlén demê de zû winda bin, dem rehmê li wan na-ke, çendî pere û avaniyêñ wan hebin... Lê ew kesen ku mal, can û tev hebûnen xwe diyari te kirine û dîkin ji wan re bibêje: Hûn mûm û finden min in û çendî dem bi pêş de here, wê navê we bi tîpêñ zêrin di dîroka gelê kurd de bê mîvisandin... Welato! Ji wan re bibêje: ji wan kesen ku ji siha xwe bi wir de, tu tiştê din nabînîn bibêje ku, tu ji şerê birakujiyê mezintir i, ji pesngirî û dudiliyê zexmtir i...

Welato! Tevî pîrbûna birînê axaffî di bedena te de, tu bi hêz û zexm i, ji ber ku tu mezin i, û ji ber ku tu mezin û zexm i tîrîn neyaran tene te û birîn di bedena te de vedibin. Belê çendî xwîn ji wan birînan bê û bîherike, ew xwîn xelas nabe û dawî wê zora demê here. Ji ber ku hin bi hin dem ji xwîna welatiyêñ te biçûktir dibe û serkeftin nêzîk dibe... Bêguman di wilo rewş de, maf ji wê gelekî giran û biha be, û berpirsîti wê hê buhatir be...

Vêca, welato ji welatiyêñ xwe re bibêje: Li tev cihen ku tê de dijîn, nefer û kom, rewşenbir û torevan, siya-setmedar û partizan, ku tu welatî tevan i, singa te ji tevan re vekirî ye. Çendî pir bin, têvel bin û ne li hev bin...

Welato! Çendî welatiyêñ te pir bin, di bîr û baweriyan de têvel û ne li hev bin nîşana xêre ye, nîşana pêşketinê ye; lê welato ji wan re bibêje:

Kuştin kuştinê tîne, zikresi zikresiyê tîne. Xwîn bi xwînê nayê şûştin, kuştina welatiyan kuştina Welat e welato...!

Û ji wan re bibêje welato, ku tu welatî tevan i, kevn û nûyê tevan i, cih û warê tevanî, hebûna te ji tevan re pîvan û terazû ye, dadgeh û dadger e... û dawî ku tu ji ramenê di serê tevan de jî firehtir û bilindtir i...

Welato! Ji wan re bibêje: Ku ne em li hev rûnîn, bi hev re kom bibin, û bi mîjîyê di serê xwe de bifikirin, pîrs û bersivêñ xwe, hawar û gaziya xwe, kul û birînê xwe ji hev re bibêjin û şanî hev bidin -ewen ku di nav xaka te de şîn dibin - em nagîhîjin armanêñ xwe û wê halê me ev hal bimîne ji kuştin û berberiyê...

Welato! ez ne bawer im ku kes kari-be pişa te bitewîne, ji welatiyêñ te pê ve û kurmê darê ne ji darê be, dar kur-

mî nabe... Bêguman zerara te ji zarokê te ye, nexusim ewêñ nezan û çavgirtî, ewêñ ku heyranêñ canê xwe tenê ne...

Welato! Me seh nekiriye ku tu hêz di dînyayê de kare welatiyêñ welatesi hevgirtî bişkîne, ku ew welati û dîn yet gotinê de dilivin... û me seh nekiriye ku tu hêzî di dînyayê de welatiyêñ welate ku hevgirtî bi hev re alîkar û hezhevkir tewandine...

Welato! Em bi hêvî ne, ku ev babîsoka ku di asîmanê Kurdistanê de li dar e, zû derbas bibe, bihayê wê hiûdik be.

Welato! Ji welatiyêñ xwe re bibêje: Ku tu qet serê xwe ji wilo bâblîsokan re danayînî, ji ber ku baweriya te di pêşerojêñ nêzîk de geleki mezin e. Ew baweriyêñ ku di guftûgo û danûstan-dinê de dibin yet û ew yet riya sex-webûn, azadî û aştiyê bi dûv xwe de dîkişîne, çendî welatiyêñ te di ramanêñ xwe de dûrî hev bin û têvel bin...

Welato! Ji wan re bêje: Yê ku bi rast û durist û welatekî dilsoz û xemxwaz be, ew berpîrs e... û ji demê re bibêje welato, nîşandin ne henek û tinaz in, nîşandin jî berpîrsi ye.

Ji wan re bibêje welato!

KONÊ REŞ

Kîsê sondê

Di vî gundi de jî weki her gundêñ welat, êş û kul tê de bûbûn lehî. Li hemberî Goşkar Baba destan tim berê xwe dabû ewran û ezman. Dar ewli-ya bûn, goristan şehîd, şikeft pîr.

Meha pûşperê rojêñ xwe yêñ dawî diqedand. Çiqas gul û kulilkêñ Deşta Gimîmî hebûn, li hemberî tîna rojî li ber xwe didan. Ji layekî ve jî, gul û kulilkêñ Çiyayê Şerefînî hawar dikirin. Her çiqas gul û kulilkêñ deşte diçilmi-sîn, gulîn Şerefînî ew qas serî radikirin, ew qas xwe li gelî û deviyan vedi-kirin, şikeftan weki bûkeke serbixêlî dixemîlandin. Di sir û seqemê de, di bahoz û baranê de ji şikeftan ci qesr û wargehîn rengîn pêk dianîn.

Di her newalekê de Siyabendek li kîleka Siyabend jî Xecêya Bêjînzirav bi bay re lorî dikirin. Xezalan, ji dûr ve li kulîlkan dînihîrtin; bi wate, bi lêbo-rîn... Belê kulîkêñ ciya bi orîn û nalinêñ ciya re, hemû dengê dîrokî weki me-losiyekî hişyar kir. Geh li ser pelêñ xwe dikirin dilop geh jî bi rengê xwe re xwes û ges dikirin. Mirovîn vî gundi bi seyr û matmayî bûn. Mele jî ew roj bê-deng û dilxîsoşe bû. Weki roja mehse-re bû; ji bo ci ewqas însan kom bûbûn?

Pîr, nexweş, bawî, yêñ xort, qîz û bûk, mirovîn ji devera navçeyê... gul û ku-lîkêñ ciya jî meş dîneqîsandin.

Asê bi pî ji Sofî re "Binêre sofî bas binêre. Ger e mirov rûkê xwe-bêsebeb û vala spî neke. Binêre baş li vê dîlanê binihîre. Heta do, yek dimir, te gazin dikirin ku kes tune bû gorê vede. De binihîre ku meytê şehîdan be, yê rast û dirustan be, yê bixîretan be erd ji ber lingan dihêje", got. Sofî li ser navê mezinîyê nediqîriya, lê belê bi her dirûş-meyê re bêvila gopalê xwe li erdê dida.

Jinan toreyêñ nû ava dikirin. Êdî tu kesi di şînan de kiras nedîcîrandin, kesî rûkê xwe nedîda ber pencan, kesî bi kulman li dilê xwe nedîda... Şîn bûbûn dîlan, wan qeyd û xelekêñ neçariyê diş-kînandin. Kela dilê xwe dikirin hel-best, dikirin kilam... Dengan xwe li Çiyayê Kemê, li Çiyayê Leglegê, li Çiyayê Lîçê, li Kûra Kêrsê digirtin; li wan deran bi tewşa kulîlkan re, bi dengê bilûrîn sivanan re dibû dîlsahî, dibû den-gê raperînan. Zarokêñ ku temeziyêñ rengîn nedîtibûn, ji wan hinekan cilpi-yêñ darê, hinekan kulîkêñ zer, hinekan jî gulîn sor hildabûn û dihejandin.

Erê, xort û qîzêñ vî gundi, tîna evîna nû, di dilê xwe de dihewandin. Ciya êdî ji wan re ne bilind bûn. Xwe di ava aza-diyyê de şûstibûn, çavêñ biriqî, biriyêñ belek, bejnêñ zirav bi devkenî hemû mirovîn di meşê de dispartin têkoşîna xwe. Di guraniyê de carekê çavêñ her-duyan bi hev ket. Ew nîhîrîn, ji wan re bû biryar. Belqîsê, careke din desten xwe da ser sêngêñ xwe. Kîsê sonda wê, bi dengê dilê wê re bilind û nîzim dibû.

Rezo bêdeng bû. Bi çavêñ xwe tûrî-kêñ mirovan dirijand. Aha mirovekî şe-

hîd! Por û simbel li wî gij bûbûn, dest li ser dilê xwe xistibûn. Do wiha gotibû: "Ma bi wî mabû ku diçû serê ciya, wê ev qebile hilweşê." Rezo carekê, du caran, sê caran, çar caran li wî nîhîrî, lê ew peyvîn wî ji xwe re nedikirin kul.

Di dilê Rezo de rastî, wekî masiyan Ava Mûradê diçûn û dihatin "Belê wê ev qebile hilweşê. Ez bi tenê ne lawê vê qebileyê me, ez lawê vî welati me. Belê dîsa jî ez dizanim dilê we piran ne wekî devê we ye. Hûn dixwazin bi vî awayî me biparêzin. Ne mirovino, na hemqebileyino, na dayê, bavo, xalo... Hûn li cotêñ xwe, hûn li kali û pîriya xwe, hûn li sol û rîça xwe, em jî li kar û rîça xwe... Dîsa jî em bi hev re, em bi hev re..." Dilê wî xwe fireh dikir. Her bêhnek ji bayê zozonan dilê wî hênik dikir û dişîdand. Çavêñ wî, li dûv hev, li her mirovî, li her kîleken goristanê, li ciya, li Kaniya Birûskê, li Waviya Qe-dê kûr û dûr dînihîrtin Pişta xwe da kîleken gora dayika xwe, ponîj. Dayika wî ji bo yek cilpiyek çixatê bêsebeb ne-yê şixulandin, diçû ji kuçikê cîranan agir dianî. Ci loqênx wês hebûna, didan wî, didan xwişk û birayêñ wî. Dayika wî jî weki her dayikêñ kurdan, ta wê demê bi bêmirodi ketibû bin erdê.

Destê xwe xist bêrika xwe, kîsê son-da xwe amade kir. Ax li ser bêrê qiloz dibû. Kîsê xwe avet gora şehîd. Hê gor nîvco bû. Belqîsê jî kîsê xwe avete gorê. Gundiyan sê heb temeziyêñ rengîn bi hev û din ve girêdan, avêtîn gora şehîd. Èsrê Rezo derkete ser xanî. Neynik li mala Belqîsê girt. Tîrêya neynikê di odayê de weki civíkeke dîl, carê fireh bi cihekê de dida. Belqîsê pace vekir, gulyekî porê xwe xist devê xwe û ke-

nekî bi mîzgîn pêşkêşî Rezo kir.

Èvarê Belqîsê satîlên avê bi milêñ xwe ve daliqand û çû ser kaniyê. Wê û hevalêñ xwe, bi henekan, bi pêkeniyân dem derbas dikirin. Zarokêñ hûr, bi pi-yen tazî li perava cihoka kaniyê, ji la-yekî ve herî dieciqandin û ji layekî ve jî, ji heriyê xanî ava dikirin.

Xatûnê bi milê Belqîsê girt û kişande paş kaniyê. Pêşniyaz li wê kirin, "Delalîkê dilê te wa ye li banî, xêr e... Nebî ku hûn birevin. Hûn rûreşiyekê wisa mekin", gote Belqîsê. Belqîsê bi çavêñ tije, bersiv da xatûne: "Belê, emê birevin, lê ne reva rûres e."

Mil û pê li Xatûnê sar bûn. Xatûnê bi kelegirî: "0xir be. Min di vî gundi de ji kî û kî hez kir ew bûn kewen refan. Zewaca bextreş! Ne ji zewacê bûya..."

Belqîsê dixwest ku dilê hevala xwe xwes bike: "Tu wan gore û fanorîyê xweşik çêke. Tu dizanî ku ta evîna nû bi ser nekeve, tu car dilê me li dinê xwes nabe. Di dîlan û şahîyan de evîna nû bi dengê xwe yê zelal bistrê.

Wê rojê, şevê tariya xwe gur kiribû. Herduyan li hewşê xwe bi dîwar ve ze-liqandibûn. Belqîsê desten Rezo da ser dilê xwe. Rezo bi henek: "Fediya reş, keçê tu çawa desten min didi ser di-lêxwe! Ma tu zilam i?"

Belqîsê dizanibû peyvîn Rezo he-nek in. Lê dîsa jî serî, pariyek di ber xwe de berda. Dawî bersiv da: "Şerî şer e ci jin e ci mîr e."

Ev pîrsa Rezo destpêka evîna nû bû: "Di kîsê te de ci hebû?"

-Çend tayêñ porê min...

-Lê di kîsê te de?

-Çend dilop ji xwîna min...

JEHAT GIMGIMK

Ev kasetə Şivan ji sala 1992'yan ve hatiye amadekirin, lê heta niha nehatubû belavkirin

Nazê:

Kasetə dawîn, lê ne ya nû!

Kasetə Şivan a dawîn bi na-vê "Nazê" derket. Kaset ji aliye Şirketa Ses Plak ve hate belavkirin. Her çend ev kasetə Şivan a dawîn jî be, ji ber ku di sala 1992'yan de hatiye amadekirin, ne ya nû ye. Lê ji ber ku kaset nehatubû belav kirin, dîsa jî Hazê kaseteke nû ye. Ev kaset, ji stranê gelêrî pêk hatiye. Li ser bergê kasetê kurtejiyana Şivan û gotinê helbestan bi kurdî û îngilizî hatine nivîsandin. Wê di nava çend rojan de, CD'ya kasetê jî derkeve.

Kaset ji aliye muzîkar Oğuz Abadan û Zahid Brifcanî ve hatiye tomarkirin. Di amadekirina kasetê de muzîkarê profesyonel wekî Ekrem Sökmen, Deniz Selman, Halil Karaduman, Samim Karaca, İsmail Derker, Celal Bağlan û Fikret Dağ xebat kirine.

Beriya niha bi çend mehan, kasete-ke Şivan a bi navê "Ya Star" derketibû, û di bingeha wî kasetî de Şirketa Ses Plakê bi destûra Şivan û muzîkarê kurd Dilşad Saïd hin guherîn çêkiri-bûn, lê di dawiyê de Dilşad Saïd nera-zibûna xwe ya ji bo vê guherîn anîbû ziman û di hevpeyyîna ku di Azadiya Welat, di hejmara yekan de derketibû, bi van gotinan gazin dikir:

Kasetə Nazê, ji aliye muzîsyen Oğuz Abadan û Zahid Brifcanî ve hatiye tomarkirin.
Di amadekirina kasetê de muzîyenên profesyonel wekî Ekrem Sökmen,
Deniz Selman, Halil Karaduman,
Samim Karaca, İsmail Derker, Celal Bağlan û Fikret Dağ xebat kirine.


"...min awazên kasetekê ji bo Şivan Perwer afirand ku yekemîn car ev awaz bi şeweyleke nûjen ji bo stranê kurdî bêñ danandin û mawey sê me-han ez xerîkî vî karî bûm... Lê mixa-bin ku Şivan ew kaset şândîye Tırkiyê û ji hinekan re destûr daye ku bi şe-weyleke tîcarî bê tomarkirin... ji bili strana "Ya Star" û "Bêje Heval" muzîka tevâhiya kasetê diguherîmin. Lê mi-xabin ku navê min li ser kasetê her maye..."

Li ser van gotinê Dilşad Saïd, de-ma me dîtinê Şivan xwestin, piştî ku got ez naxwazim bikevime nav pole-mîkan, ev li gotina xwe zêde kirin:

"Dilşad di warê siyâsi de tune ye, sıfır e, lê hunermendekî pir mezin e... Eger ev gotin, gotinê wî bin, ew di-kare her gav di warê siyâsi de xetaye-ke wer bike; dîsa jî jê neaciz im. Lê ev

tişt ne rast e. Min û Dilşad, me xebateke baş kir û tiştên wî, bi min jî pir xweş hatin... Ez gelekî spasiya wî dikim û her gav jî wekî birayekî ezîz lê dinêrim. Muzîka me li Stenbolê guherandin, tu sûcê min tê de tune ye... Kaset çer gihişt destê min, ez jî li vira bi qasî Dilşad aciz bûm..

Min direkt ji wan re got; vê muzîkê wanî dernexin, ez naxwazim, ez nikarim lê guhdaři bikim. We keda me mehf kir û berda... Ez dixwazim; kaset wekî ku min û Dilşad çêkiriye derkeve.. Û di çapa duyemîn de wekî min û Dilşad derxistine. Dilşad hunermend û birayekî ezîz e, gerek xwe aciz neke û hûn jî guh nedin tiştên wer..."




Di kasetə Nazê de ev helbest hene: Nazê, Hoy Nazê, Lê Nazê, Nazliyê, Cihan, Qimil, Nemire Lawik, Xora, Xalo, Kanî, Leyla, Ximximê.

RAHMÎ BATUR

Me kostek qetand

OSMAN ÖZÇELİK



Di jiyana mirovan de rojêن taybet hene. Hin roj hene di her salvegerê de têb bibîranîn, hinek jî bes di wê rojê de bi merasîmekê têb derbaskirin. Roja destgîriyê rojeke girîng e. Biryardayîna jiyaneke nû ye. Ji bo wê rojê merasîmeke biçûk tê lidarxistin û pişt re tê jibîrkirin. Roja zewacê ne wisa ye. Merasîma wê jî bi helahela ye û di her salvegerê de, biçûk an jî mezin şahiye, bîranînek çêdibe. Di jiyana mirovan de gelo zewaca bi def û zirne; kêt û dîlan girîng e, an roja biryardayîna zewacê?

Kurd, gelekî bişûndemayî, têzanîn û tê gotin ku "kurd qîmetê nadîn rojên taybet yêş şexsî. Di jiyana civakî de cihê zarok û jinan jî ber çavan dûr e."

Na, ne wilô ye.

Di nav kurdan de mirov, gelek bi qedr û

qîmet in. Ji roja ku zarok dikeve rehmê dayikê û heta dikeve bin axê, di her pêvâ-joyê de xwedîyê rojên taybet e. Ji van rojan yek jî "roja destpêka meşê" ye. Kêm-zêde her zarok di navbera deh mehî û çardeh mehiya xwe de, dest bi meşê dike. Min nebihiştiye ku di nava tu gelan de ji bo destpêka meşê, merasîmek pêk tê. Kurd, ji bo roja destpêka meşê, şahiya "Kostek Qetandinê" pêk tînin.

Di vê rojê de diya zarok, xwe û zarok dixemîlinê. Mal, der û dor pak tê malaştin. Zarokên malê yên mezintir û zarokên cîranan li malê têb ba hev û din, her du lingêñ zarok bi pêş de dirêj dibe; xwas e, bi tayekî xav her du pêçiyêñ lingan ên girekê bi hev û din ve têne girêdan. Ji êmîşan; nok, gûz, behîv, qizwan, sadan, mewîj, bastêq, şekir, tûyêñ hiskirî, li malê çi hebe, ji her beşî mistekê dixin dawa zarok. Paşê, ji zarokên din yek, bi destekî, tayê xav kaş dike, diqetîne, bi destê din mistek êmîş direvîne û baz dide, direve. Zarokên din jî êmîşen mayîn direvînin û diçin.

Kosteka lingêñ zarok qetiyaye, di dawê de êmîş jî nemaye. Ew jî radibe ser lingan û bi gavê xwe yêñ biçûk dide ser pişta

zarokan. Dimeşe, diçe...

Ku zarok nikaribe bibeze, rojeke din qetandina kostekê tê ceribandin.

Ev roj wisa, bi şahiyeke biçûk, belê bi wate derbas dibe. Ew roj tê jibîrkirin. Ji zarok re jiyanekî nû dest pê dibe. Êdî zûr dikare xwe bigihîne xwestekên xwe, dikare zûr xwe ji xetereyan bi dûr bixîne, xwe biparêze. Serê zarok rabûye ser laşê wî û êdî mîjî bûye serwerê laş. Bergeh û dîtina çav fireh bûye. Roj bi roj ling xurt dibin, dikarin laş hilgirin. Tîrsa kûtbûyin û bawî-mayînê jî nemaye. Ev merasîma hanê şahiya van tiştan tîne ziman.

Kurdên ku bi hezar salan li erdê, serî di berde, bêtaqet mane, gelek caran ceribandinê rabûna ser lingan kirine. Carinan bi ser ketine û carinan jî têk ve çûne.

Îro em dibînin ku gelê kurd kosteka xwe bi xwe qetandiye. Gelê kurd rabûye ser lingan, bi hêz dimeşe. Dixwaze xwe bigihîne neteweyêñ din. Wekî gelên dinê, sazû-manen xwe ava bike. Ketine dûv jiyaneke bi rûmet. Di dawîya sedsala bîstan de me kostek qetand. Xwedê ji me û sedsala bîst û yekan re mezin e.



Xalê Zahir

Di sala 1993'an de, li Girtigeha Bayrampaşa Stenbolê, hevalêkî kal i 80 salî hebû. Hevalan jê re digotin "Xalê Zahir." Hevalêkî kêfxweş û li ser xwe bû.

Rojekê dîlên şer hemû dikevin rojiya birçibûnê, Xalê Zahir jî dibêje: "îllahî ez jî gerek e bikevim rojiya birçibûnê." Heval jê re dibêjin: "Xalê Zahir, tu nikarî birçî bisokinî, tu kal i." Welhasil, Xalê Zahir jî dikeve greva birçibûnê. Grev wê du rojan bidome. Şeva greva birçibûnê ya yekemîn Xalê Zahir nayê xuyakirin. Heval gişt lê di-


gerin, lê wî nabînin. Hevalek, bangî hevalên din dike û dibêje: "Heval herin! Xalê Zahir li ser cihê xwe ye û nen dixwe."

Heval hemû şaş dibin û tevde diçin ser cihê Xalê Zahir. Xalê Zahir jî, wan dibîne, lê li xwarina xwe devam dike. Heval jê re dibêjin: "Xalê Zahir ci dikî? Tu çima nan dixwî? Tu neketibûyi greva birçibûnê?"

Xalê Zahir jî bi ken bersivê dide: "Welleh lawê min, mele bang da û bi şûn de min nan xwariye!"

YUSUF YALAVUÇ

XELAT...



Bersiva Xaçepirsê (10)

Xaçepirsâ me bixelat e. Di 15 rojan de ci bersiv bigihîjin me, emê wan binirkînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 12'an kasetta

Sîvan Perwer
"Naz" ye.



Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, dîvê hûn "Peyva Veşarı" di nava qutiyenî li bin xaçepirsê de binivîsin û tevi adresa xwe jî me re bisinîn.

Kesên ku xelata xaçepirsâ 10'an kitêba Sadık Hidayet "Kundê Kor" qezenc kirine: Abdi Taşkın/Bartın, Evin can/Izmir, Gökmen İldeniz/Adana, Filiz Yücel/Diyarbakır, Mehmet Yıldız/Diyarbakır, Rênas Hêvidar/Elbistan, Aydin Ösun/Adana, Ömer İlhan/Mardin, Murat Kaya/Bartın, Ali Ayaydin/Ağrı

Bav û Kur

Rojekê bav û kur diçin nêçirê. Di neçirê de, roviyekî dikujin. Bav ji kurê xwe re dibêje: "Kurê min, emê herin gund. Di civata gund de ezê bibêjim min roviyek kuş, boça wî sê metro bû, eger bawer nekirin, tu carekê bikixe. Ezê bibêjim du metro bû, dîsa bawer nekirin tu bikixe."

Lawê wî "Erê bavo", dibêje. Kur û bav lê dixin, diçin civata gund. Di civatê de hinek gundi xeber didin, car caran jî derewan diavêjin. Dor tê yê me. Bavê lawik dibêje: "Hevalino, hûn bawerî bi Xwedê bin, min iro roviyek kuş, boça wî sê metro bû."

Lawik lê dinihêre ku kesekî bawer nekir, dikux. Bavê wî kin dike, dibêje: "Na lo, du metro hebû."

Law mêze dike ku kes bawer nake. Dîsa dikux. Bav dîsa boça rovi kin dike: "Metroyek bû.", dibêje.

Li dû xeberdiana bav, tavuk (glawik) difire qirika lêwik û kuxuk pê digire. Dibe "oho, oho"ya wî û nasekine. Bav dibêje: "Boça rovî nîv metro bû, bîst santim bû... Pênc santim bû." Mêze dike lawê wî dîsa dikux. Îcar bav hers dibe, dibêje: "Malkambax ma boça wî roviyî qet tune bû?!"

EYÜP DEMİR

Xizir bireve

Mirovêkî pir feqîr û belengaz hebûye. Gelek zarokêni wî û bi tenê kereke wî hebûne. Bi wê kera xwe diçe daristanê, êzingan li ke-ra xwe bar dike û tîne bajêr, difiroşe. Ew idara zarokêni xwe bi wî awayî dike.

Rojekê dîsa li kera xwe êzing bar ki-rine û ji daristanê vedigere. Lî belê di riyekê pir xerab re derbas dibe. Rê mîna pira selewatê bûye; riyekê pir teng, yek pê û li binya rê jî, geliyekî pir kûr

hebûye.

Wexta ku tê, piyê kera wî dişiqite û ker hinekî hot dibe. Belengazê êzingavan, mecbûr dimîne gazi Xizir dike. Ji aliye kî ve "Ya Xizir, ya Xizir" dibêje û ji aliye din ve jî, dest diavêje kerê ku ker di gelî de neçe xwarê.

Dike, nake ker nayê zeffkirin, difikire û dibêje hema ker çû, qet nebe bila tiştek bi Xizir neyê û dibêje:


- Xizir bireve, ker hat....

AHMED BAZIDI

XAÇEPIRSA BIXELAT (12)

XAÇEPIRSA

Roman Nivîskareki kurd (wêne) Taybet	Metod Qertafeke nebi-navkirî	Oksijen	Di felsefeyê de raman	Sema
Beşek ji mil Sembola terbiyûmê	Kar	Mercek Kin-nivisina kilometre	Püsiyek	Çerçili
Kincek	Notayek Şervan	3	Mérخas Pêxember ek	2
Sebeb	Kin-nivisi- na litreyê	Navek	Kor Xweya asitê	
Operasyon	Hind-Ewrûpi Navek	Beyreq	Navek Xerîb	Sembola nîkelê
Din Hidrojen	Texê qalind			
	Xiyanet			



PEYVA VEŞARI

1 2 3 4 5



37 can de dewe müci ve saybî

Nijdiya hîre asmyo Sêwaz de dewle kirmanço sero heşining ke bena hed û hecave xo çîno. Heto jûra kuno dewo qelfe qelte beno erzeno jîndan işkence keno, vano dewane xo tal kene, heto binraçî eke kerd tal wejdane vane tese PKK vez zemane.

Na politika newî niha waxtoke Sêwaz de 37 hunermendant

Tevî eke Sêwaz bi 1920 ci eno insan ve. Waxtoke temelê dewleta tirkî newde ez-jiyane Atatürkü heto jûza kurmanco sezo tulé tule dubazay virastene. 1920 de Atatürkü venda Miço Axa, Diyap Axa, Hesen Xeyrî jûçi Koçgirna venda Axmed Ramîz berd kerd mebûs. Atatürkü hergu ci kerdî hazir. Ankara de dasese eşkere ewe kince kurmanco xemelna dayî emre Hesen Xeyrî

di dumare 7-8 seziçi xemelnay boyna lewe xo de fetelnay heto jûzo eve ni dûvaro mebûsî qan kesdi heto binraçî. Nurettîn Paşa be Esqiya Osmano deng rusna Koçgirî ser. Ordiye miştî ze çek çekayı kut Divrigî-Zara-Umraniye mal milk talan kerd, qome uzay de are doman pil nevake qit kerdî.

Nika ci na polîfiqa dewleta berdevam kena. Heto jûra mebûso bena lawe xo, erê yino qewete cena welate ma vêsnene. Tawî eke xayînê ma nebe dewleta tirkî ci niya ret ret îsone ma qir nekena, dewonê ma, bironê ma, sukonê ma nevêsnene. Rey niyadezme waxtoke Botan de vêsay dewî, birî CHP be DYP ra hukumet bî. Onca eke Şirnex, Lîce, Dêrsim vêsanî, parti hukumet bî. Heto jûzake mare ni qedayî kerdî, onça eke ma rey da nînî ri cene yane qewete cene dayîna zaf

kisene, vesnene.

Kamar Gencî 91 ra nat hukmato debî, ci qedeke bi pezo ame Kurdistan ser. Gonî ze lesez Siye nijdiye 3000 dewî bi tal, 4.000.000 îsone ma bi goçer, oncaci mamekiyera 5900 rey Kamer Genç re vejiya. Jûke xayînê kesde toke dest kerd mianera o tenena zaveş sono. Mesleya Sêwaz ci hene-na. İsonê Mamekiye rey daci yiçi dewete guzela dene Sêwazî keno tal. Ez yî xayîn re tawa nevon, xayîn xayîn o. Ma yiyeke rey do nînî rey qafika xo bizere wezze di des-tonê xo, gos vijdane xo seneşe eke vijdan mendo. Yaçî rey seze jazo dazu kam nînî qebûl keno, yaçî Xizir Paşayê Sêwaz ra qeyr kame, miyaze nîne qebûl keno gulange dane ci.

KAZIM TÎMURLENG

bernameyên girîng didine vî hevalî, bi rastî ez pir meraq dikim. Ev heval ji roja ku TV'ye dest bi weşanê kir û heta iro, di karê xwe de bi pêş neket. Jixwe a pir girîng ew e ku, em qet tiştekî nizanibin jî, her roj em ji roja berî, başdır bin.

A duymîn: Programa "Kenêres" e. Van hevalan jî, mirov dibêje qey di jiyanâ xwe de carekê jî li filmekî, şanoyekî, an jî skêceke komedî temaşê nekirine. Erê mafê kesî tune ku bibêje bila wekî Şarlo bin. Lî hema ev qas jî kemasî û erzanî nabe.

Ji ber vê ez dibêjim, di dema iro de, televîzyon di warê zanyarî, hunerî, çandî, propagandayê de pir girîng e. Di dîroka me de ev derfeta mezin yekemîn car ketiye destê me, divê em baş bi kar bînin. Pêwist e ku di her warî de em jiyanekî nû û xwes û rast û bi rûmet ava bikin. Pêwist e ku her xebatkarekî TV'ye wekî gerîlayekî jîhatî û bi huner be. Hemû saziyên me bi kedeke giran û bi rûmet ava dibin. Divê ku her mirov mafê vê keda xweşik bide.

Iro gelê kurd şer dike û bingeha wî şerî li ser rastî û heqanîyetê ye. Her wisa tevgereke xurt tê meşandin. Kurd bi şer re saziyên xwe jî dadimezirîn.

Bi taybetî, TV'ya Medê iroj di jiyana kesen kurd û şo-resgerên Tirkîyeyê de tiştekî girîng û mezin e. Lî mixabin televîzyona Medê di rewşa iro de xwedî pir kemasî û çewtiyan e.

Em karin bibêjin TV hîn nû ye, hîn zarok e. Gelê kurd di dîroka xwe de ji aliye çapemeyîne (rojname, kovar, pirtük) ve xwedî tecrûbe ye, lî di warê TV'yan de xeşîm e. Derfetîn wî hindik in. Buhaya weşana TV'ye giran in û hwd.

Çiqasî ev raman û dîtin rast bin jî, heqê her kesê kurd û ke-sê şoreşger heye ku karibe rexneyên xwe li TV'ya kurdî bigire. Di vî warî de ez karim der heqê du bernameyan de dîtin û rexneyên xwe bibêjim.

A yekemîn: Pêşkêşvanê programa "Got û bêj" Eyüp Burç e. Ev heval ne bi kurdî û ne bi tirkî baş dizane. Di vî warî de kesen wekî Günay Aslan û Dilbixwîn hene. Çima van

**Heqê her kesê kurd
û kesê şoreşger
heye ku karibe
rexneyên xwe li
TV'ya kurdî bigire.
Di vî warî de ez
karim der heqê du
bernameyên de
dîtin û rexneyên
xwe bibêjim.**

Televîzyona MED'ê û saziyên kurdan

Ji karistana tûxlayan kurd bi saxî têne biraştin

'Ne ji van karxaneyên tûxlayê be, emê ji nêzan bimirin.
Lê me dixebeitînin jî, dîsa em dimirin. Ji ber toz û zibilê.

Ez 3 sal û nîvekê şixulîm. Niha ez ji ber gurçik
û mîdeya xwe nesax (nexweş) im. Mafê sîgorteyê nadîn
me. Firinê tûxlayan pir germ in. Em di germahiya 80
pileyî (dereceyî) de kar dîkin. Em bi saxî têne biraştin.'

Turgutlu, navçeya Manisa-yê, nifusa wê nêzîkî 100 hezarî ye. Li dora 20 hezarî jî kurd lê dijîn. Taxênu ku kurd lê dijîn ev in: İslasyon, Topsahası û Bozkurt.

Di nava 5–6 salêñ dawîn de, li gorî gotinan nêzîkî 5 hezar kurd li Turgutluyê bi cih bûne. Kesêñ kurd li vê navçeya herêma Egeyê van karan dîkin: Bi taybetî di karxan û karistanêñ tûxlayan de dişixulin, çandin û çinîna fêkiyan dîkin û li bazaran jî wekî esnaf jiyanâ xwe didomînîn.

Li navçeya Turgutluyê, li dora 100 Karistanyêñ tuxlayê hene. Navê hinekan ji wan: Mekan Blok, Kudret Blok, Has Blok, Dolar Blok, Dağ Blok, Bağ Blok, Örtop Blok û hwd..

Li her karxanayekê li dora 50'yi mirov dixebeitin. Bi piranî jî, xebatkarêñ wan kurd in. Li van Karistanyêñ tûxlayan jin û mîr koletiyê dîkin. Binêrin kedkarekî kurd Mithat Gülcüzi ci dibêje:

— Ne ji van Karistanyêñ tûxlayê be, emê ji nêzan (birçınan) bimirin. Lê me

dixebeitînin jî, dîsa em dimirin. Ji ber toz û zibil. Ez 3 sal û nîvekê şixulîm. Niha ez ji ber gurçik û mîdeya xwe nesax (nexweş) im. Mafê sîgorteyê nadîn me. Firinê tûxlayan pir germ in. Em di germahiya 80 pileyî (dereceyî) de kar dîkin. Em bi saxî têne biraştin.


Di van Karistanyêñ tûxlayan de, yên dimîrin jî hene û yên tilî an jî destê wan qut dibin jî, hene. Yek ji van apê Hesen e (Hasan Oğuzhanlı).

Bi eslê xwe ji Amedê ye. Kêfa wî pir ji Azadiya Welat re hat û çavêñ xwe girtin, devê xwe vekir:

— Tu dibînî min piyê (milê) xwe winda kir. Piyê min kete ber valsê. Vals, mekîneya ku axa dibe tûxla, dihêre. Ez li Karistana Yavuz Blokê dişulîm, min tazmînat jî nestand.

Li gorî kurdên li Turgutluyê dijîn, niha kargeriya Karistanyêñ tûxlayan nema karkeren kurd digirin. Sedem jî ew e ku, dibe ku ew kes endamê PKK'ê bin. Lê çawa der heqê wan de lêpirsinê çêdîkin, ne diyar e. Bes tê zanîn ku lêpirsin çêdîbe.

FEREC KURÊŞİVAN



Hesen Oğuzhanlı (Amed) gava ku li Karistana Yavuz Blok de dixebeitî, milê wî kete ber mekîneye û jê bû. Wî tezmînat ji ji karistanê nestand.



Li Karistana Örtop Blok ya li Turgutluyê, kesêñ kurd, jinûmîr bi hev re dixebeitin. Hem jî bêyî ku tu teminateke wan hebe. Di gel vê rewş kambax, xwedîyê karistanan kurdan nagirin kar. Dibe ku ew kes PKK'yî bin!